

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ



EREBÊ ŞEMO Û FERHENGOKA ROMANÊN WÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

XWENDEKAR

Medya KARAKAYA

ŞEWİRMEND

Dr. Öğr. Üyesi Haşim ÖZDAŞ

Van-2021

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



EREBÊ ŞEMO VE ROMANLARININ SÖZLÜKÇESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

ÖĞRENCİ

Medya KARAKAYA

DANIŞMAN

Dr. Öğr. Üyesi Haşim ÖZDAŞ

VAN-2021

(Lîsansa Bilind)

Medya KARAKAYA

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Cotmeh-2021

EREBÊ ŞEMO Û FERHENGOKA ROMANÊN WÎ

KURTE

Ev lêkolîn bi armanca pênasekirina Erebê Şemo û destnîşankirina hin hêmanên axaftinê yên di nav romanên wî de derbas dibin hatiye kirin. Di lêkolînê de jîyana Erebê Şemo, kesayetîya wî ya edebî, hin lêkolînên li ser kesayetîya wî ya edebî hatine kirin û helwesta romanên wî hatiye lêkolîn kirin. Di heman demê de 5 romanên Erebê Şemo hatin lêkolîn kirin û hin hêmanên axaftinê yên di 5 romanên da cih digirin bi rêbaza analîzkirina belgeyan hatin destnîşankirin. Hêmanên axaftinê yên hatine destnîşankirin bi tabloyan hatine nîşandayîn. Di tabloyan da hejmara peyvê, wateya peyvê, mînaka peyvê û hejmara rûpela romanê cih digire. Bi tevahî 325 peyvên kurdî hatine rêzkirin. Wateyên peyv an komepeyvên di 5 romanên de hatine destnîşankirin bi alîkariya ferhengên curbecur hatin destnîşankirin. Di romanên de gelek peyvên biyanî yên wek ermenikî, rûsî û tirkî cih bigirin jî xebat tenê li ser peyv û komepeyvên kurdî hatiye kirin.

Di vê lêkolînê da du rêbaz ji bo berhevkirina daneyan hatin bikaranîn. Rêbaza yekem xwendina pirtûkan û destnîşankirina hêmanên axaftinê yên têkildar e. Rêbaza duyem jî rêbaza fişan e ku di tomarkirin û senifandina kategoriya daneyan de tê bikaranîn. Di encama van rêbazan de hat destnîşan kirin ku Erebê Şemo di romanên xwe de hêmanên vegotinê yên kurdî bi lêvkirineke xweser vegotine û ev hêman bi tundî bikar anîne û wî tevkarî ji bo pêşîgirtina windabûna hin hêmanan kiriye û romanên wî di geşedana zimanê kurdî de xwedî cihekî girîng in.

Bêjeyên Sereke: Erebê Şemo, Roman, Peyv, Ferhengok.

(Yüksek Lisans Tezi)

Medya KARAKAYA

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Ekim-2021

EREBÊ ŞEMO VE ROMANLARININ SÖZLÜKÇESİ

ÖZET

Bu çalışma, Erebê Şemo'un tanıtılması ve romanlarında geçen bazı söyleyiş unsurlarının belirlenmesi amacıyla yapılmıştır. Bu çalışmada Erebê Şemo'nun hayatı, edebi kişiliği, onun yazım hayatı üzerine yazılan bazı çalışmalar ve romanlarının yazım tarzına yer verilmiştir. Aynı zamanda Erebê Şemo'nun 5 romanı incelenmiş ve romanlarda geçen bazı söyleyiş unsurları doküman incelemesi yöntemiyle tespit edilmiştir. Belirlenen söyleyiş unsurları tablolarla gösterilmiştir. Tablolarda kelime sayısı, kelimenin anlamı, kelimenin örneği ve romanın sayfa numarası yer alır. Romanlarda geçen kelime veya kelime gruplarının anlamları çeşitli sözlükler yardımıyla tespit edilmiş ve çalışmada toplam 325 Kürtçe sözcük unsurları listelenmiştir. Romanlarda Ermenice, Türkçe ve Rusça gibi bir çok sözcük mevcuttur. Fakat çalışma sadece Kürtçe kelime ve kelime grupları üzerinde yapılmıştır.

Bu çalışmada verilerin toplanmasında iki yöntem kullanılmıştır. Bunlardan birincisi kitapların okunması ve ilgili söyleyiş unsurlarının belirlenmesinde kullanılan doküman incelemesi yöntemidir. İkincisi ise elde edilen verilerin kayıt ve tasnifinde kullanılan fişleme yöntemidir. Kullanılan bu yöntemlerin sonucunda Erebê Şemo'nun romanlarında Kürtçe söyleyiş ifadelerine kendine has bir ağız ile yoğun biçimde yer verdiği görülmüş ve bazı söyleyişlerin kaybolmasının önlenmesine katkı sağladığı ve onun romanlarının Kürtçenin gelişiminde önemli bir yeri olduğu sonucuna ulaşılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Erebê Şemo, Roman, Sözcük, Sözlükçe.

(M. Sc. Thesis)

Medya KARAKAYA

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSTY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

October-2021

EREBÊ ŞEMO AND HIS NOVEL'S GLOSSARY

ABSTRACT

This study was carried out in order to introduce Erebe Şemo and to determine some of the utterances in his novels. In this study, the life of Erebe Şemo, his literary personality, some studies on his writing life and the writing style of his novels are included. At the same time, 5 novels of Erebe Şemo were examined and some utterances in these novels were determined by document analysis method. Determined utterance elements are shown in tables. Tables include the number of words, the meaning of the word, the example of the word and the page number of the novel. The meanings of the words or word groups in the novels were determined with the help of various dictionaries and a total of 325 Kurdish word elements were listed in the study. Although there are many words such as Armenian, Turkish and Russian, only Kurdish words and phrases were taken into account in the study.

In this study, two methods were used to collect data. The first of these is the document analysis method used to read the books and determine the related utterance elements. The second one is the filing method used in the recording and classification of the obtained data. As a result of these methods used, it was seen that Erebe Şemo intensively included the expressions of Kurdish utterance in his novels with a unique dialect, and it was concluded that he contributed to the prevention of the disappearance of some utterances and that his novels had an important place in the development of the Kurdish language.

Keywords: Erebe Şemo, Novel, Words, Glossary.

PÊŞGOTIN

Ev lêkolîn li ser bingeha pênasîna Erebe Şemo û bi armanca aşkerekirina taybetmendiyên zimanî yên di berhemên Erebe Şemo da ku yek ji nivîskarên navdar ê edebîyata kurdî ye, hatiye encamdan. Me hewil daye ku li ser girîngtirîn Erebe Şemo û berhemên wî bixebitin. Lewra jî jîyan û xebatên li ser keseyatîya wî ya edebî û 5 romanên nivîskarî hatine destnîşankirin û lêkolîn li ser hatin kirin. Di wî awayî jî hêmanên vegotina nivîskar yên ku di nava wan berhemên da cih digirin hatine diyarkirin û tomarkirin. Ji bo her bêje anku komebêjeyekî fişek cuda hatiye dariştin ku wate rêjeya bikaranîna (li gorî her berhemê) û hejmara ku têda nivîskar amajeyê bi wan bêje yan komebêje li xwe dike cih digire. Me di lêkolîna de peyv û komepeyvên taybet bi rêbaza analîzkirina belgeyê destnîşan kirine û nîşeyên xwe ji hêla fermanameya tarîxê ve derbasî fişan kiriye. Li ser fişî wateya peyvê, mînak peyvê û hejmara rûpelê cih digire. Herwiha ji bo her fişekê hejmarek hatiye diyarkirin. Wateya wan bêje û komebêjeyên nivîskar yên bi lêvki ku di nava fişan de cih digirin bi rêya sûdgirtin ji ferhengên curbecur hatine destnîşankirin. Herwiha me wateya bêje û komapeyvên romanên yên ku di ferhengan da cih negirtine bi rêya sûdgirtin ji çavkanîyên devkî û lêkolîna meydanî li herema serhedê (bi taybetî li Qersê ku cihê ji dayîkbûn û mezinbûna Erebe Şemo ye) diyar kirine.

Lêkoler hêvî dike ku karibe romanivîs û wêjevanê Kurd Erebe Şemo bide nasîn û rê li ber taybetmendiyên zimanê romanên wî veke û wateya wan bêje û komebêyan zelal bike.

Bi vê esasê re, di dawîya merhaleya xelasbûyîna tezê de şewirmendê tezê birêz Doç. Dr Ömer ÇİFTÇİ wefat kir. Ez dixwazim spasîyên xwe yên taybet pêşkeşî wî bikim. Serbilind û rêzdar im ji bo giyanê wî ku ez bi rê û rêbazên xwe gihandime vê encamê. Disa ez spasîyên xwe pêşkeşî mamosteyê xwe birêz Sabir Ebdulahîzad dikim ku di her konaxa pêvajoya vê xebatê de alîkarîya min kiriye. Di dawîya merhaleya xelasbûyîna tîzê de ji ber wefata birêz Doç. Dr Ömer ÇİFTÇİ karûbarê tezê birêz Dr. Öğr. Üyesi Haşim ÖZDAŞ wergirt ser milê xwe spasîyên xwe pêşkeşî wî jî dikim.

Medya KARAKAYA

VAN-2021

KURTEBÊJE

K.T.	: Komara Turkiyê
T.C.	: Türkiye Cumhuriyeti
HP	: Hejmara Peyvan
ŞK	: Şivanê Kurmanca.
Ber	: Berbang.
JB	: Jîyana Bextewar.
R	: Rûpel
HR	: Hejmara Romanan
Dim	: Dimdim.
Hop	: Hopo.
FZZ	: Ferhenga Zanînê. Berhevkar: Zanyar.
FCEB	: Ferhenga Celaddet Elî Bedirxan.
FDUD	: Ferhenga Destî. Umît Demîrhan.
FK	: Ferhenga Kamêran. Kamêran Silêman Botî.
FWK	: Ferhenga Wikîferhengê.
FDÎ	: Ferhenga D. Îzolî

NAVEROK

ÖZET	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
KURTEBÊJE	V
DESTPÊK	1
Armanç û Girîngî.....	1
Pirsgirêka Problemî.....	2
Texmînî.....	2
Sînordarî.....	3
RÊBAZA TEZÊ	3
Gelaleya Lêkolînê.....	3
Gerdûn û Nimûnekirin.....	4
Amûrên Komkirina Daneyan.....	5
Teknîka Hûrnêrîna Daneyan.....	6
1. EREBÊ ŞEMO WEŞAN Î LÊKOLÎNÊN TÊKILDAR	8
1.1. Jîyana Erebê Şemo.....	8
1.2. Berhemên Erebê Şemo.....	11
1.3. Kesayetîya Erebê Şemo ya Edebî.....	12
1.4. Weşan û Lêkolînên Têkildar.....	16
1.4.1. Hin Weşan û Lêkolînên li ser Kesayetîya Erebê Şemo ya Edebî.....	16
Hatine Kirin.....	16
2. HELWEST Î FERHENGOKA ROMANÊN EREBÊ ŞEMO	22
1. Helwesta Romanên Şemo.....	22
2. Ferhengoka Romanên Erebê Şemo.....	28
ENCAM Î PÊŞNÎYARÎ	70



TABLO

Tablo 1. Kunyeya Romanên Erebê Şemo yê Hatine Lêkolînkirin.....5

Tablo 2. Peyvên di Romanên Erebê Şemo de Hatine Destnîşankirin 28



DESTPÊK

Erebê Şemo, li ser rewşa jîyana civakî, sîyasî, medenî û eskerî ya kurdan bi dehan berhem nivîsandine. Wî bi çavê projeyekê li nivîsên xwe nêrîye. Wî dixwest ku hişeke nû ji bo civakê ava bike û bi rêya berhemên xwe gelek tiştan nîşanî gelê xwe bide. Em di berhemên wî da rastî berxwedana neteweyî ya kurdan tîn. Wî kevneşopîya gelê kurd bi helwesta Realîzma Sosyalîst honandîye. Ew bi romana xwe ya yekem a bi navê “Şivanê Kurmanca” dest pê dike û heta romana xwe ya dawî anku “Hopo”yê wê rêçê dixemilîne. Berhemên wî li gelek zimanan hatine wergerandin. Van salên dawî berhemên wî li bakurê Kurdistanê bi eleqeyeke mezin tîn pêşwazîkirin. Ew eleqe bi gelemperî li ser romanên wî ne. Cihê gotinê ye ku wî gelek cureyên nivîsê ceribandine, lê ew qalib û cureyê ku bûye sedemê navdarîya Erebe Şemo, romanên wî ne. Ji ber ku ew yekem romanivîsê kurd e, nasnavê “Bavê Romana Kurdî” lê tê. Heta sala 1930î, ji bilî wî ti nivîskarekî li ti devereke Kurdistanê roman nenivîsîye. Romana kurdî ya yekem ji aliyê wî ve tê nivîsandin. Herwiha cihê gotinê ye ku di nav berhemên wî da 5 berhem wekî roman hatine qebûlîkirin.

Devoka ku Erebe Şemo di romanên xwe da bikar anîye, devoka Serhedê ye. Gotin û peyv bi şîrovekirina lêvîkirineke xweser hatine xemilandin. Peyvên biyanî yên wekî rûsî, ermenîkî, tirkî; hevokên axaftina xwecihî û gotinên xweser ên taxî pir zêde ne.

Di vê xebatê da, derheqê daxûyanîyên ku li ser gotinên taxî hatine kirin, li gor wan daxûyanîyan, hêmanên axaftinê yên di romanên Erebe Şemo da derbas dibin hatine dîyarkirin û ev hêman di ferhengên curbecur de hatin berawerdkirin û nirxandin.

Armanç û Girîngî

Armanca vê lêkolînê pênasekirina Erebe Şemo û dîyarkirina hêmanên vegotinên di 5 romanên wî de û herwiha kifşkirina wan hêmanan e, ji hêla kurmanciya gelemperî ve. Bi giştî armanç ev e ku hin xebatên heta niha li ser nivîskar hatine kirin di yek xebatê de bînin kom kirin û vegotinên di romanên wî de

bên zelal kirin.

Di vê xebatê da hatiye dîyarkirin ku peyvên nivîskar yên di nav romanên da derbas dibin çi ne. Herwiha wateya wan gotinan û çavkanîyên ku ew gotin tê da derbas dibin jî hatine destnîşankirin. Bi vî rengî, peyvên wî yên ku bikaranîna wan di nav zimanê kurdî da rojbiroj kêm dibin, bi sûdgirtin ji şêwaza lêkolînê ya wesfî û çendî bi rêgez û pergala hatine nivîsandin. Bi vê xebatê re, dê pêşîya berhevkirina ferhengên curbecur yên şexsî li ser bingeha gotinên xweser, were vekirin.

Li ser bingeha encamên ku hatine bidestxistin, dê bi rêya nirxandina zimanê ku di romanên xwe de bi navgîniya lêvkirineke xweser bi kar aniye, nêrînek rexneyî li ser nivîskar Erebe Şemo û romanên wî bide çêkirin.

Ji alîyeke din ve ev xebat yekemîn lêkolîn e ku li ser Erebe Şemo û romanên wî hatiye kirin. Tê pêşbînîkirin ku ev lêkolîn ji bo qada ziman û edebiyata kurdî ya nivîskî feydeyekê bi xwe re bîne.

Pirsgirêka Problemî

Pirsgirêka sedema lêkolîna vê mijarê çi ye? Bi çavdêrî û lêkolînên xwe em dê xwe bigihînin agahîyên jêrin. Ev agahî jî:

1. Erebe Şemo kî ye, heya niha çi xebat li ser nivîskarê kurd Erebe Şemo hatine kirin û di romanên wî de çi cureyên vegotinên bi lêvkirina wî hene û dema ku bi ferhengên curbecur de tînin nirxandin, dewlemendiya van hêmanan di çi astê de ne?
2. Di romanên Erebe Şemo de hêmanên vegotinên lêvkî çi ne?
3. Dema ku ew hêman li gorî têgihên kurdî tînin nirxandin dewlemendiya van di çi astê de ye?

Texmînî

Di vê lêkolînê de;

1. Rê û teknîkên ku bi wergirtin, analîzkirin û şîrovekirina daneyan de tîne bikaranîn ji bo pêvajoyên tîkildar re, rêbaz û teknîkên guncav in,

2. Tê texmîn kirin ku wateyên ji çavkanîyên curbecur ji bo peyv û komepeyvên hatine wergirtin û wateya wan hatine destnîşankirin, bi vegotinên nivîskar re têkildar in.

Sînordarî

Ji alîyê sînorkirina lêkolînê ve Erebê Şemo li ser gelek mijaran hin berhem nivîsandine;

1. Di nav berhemên Erebên Şemo da 5 berhemên ku cureyê wan roman e hatine destnîşan kirin.
2. Ev lêkolîn bi hêmanên bi lêvkirina vegotinên di nav wan 5 romanên da hetîye sînorkirin.

RÊBAZA TEZÊ

Gelaleya Lêkolînê

Ev xebat li ser bingeha şewaza lêkolînê ya wesfî pêk hatiye, bêje û komebêjeyên di nava romanên nivîskar da destnîşan dike û wateya wan, rêjeya bikaranîna û hejmara rûpelên ku wan daneyan li xwe digirin pêşkêş dike.

Lêkolîna wesfî di pêvajoya lêkolînê da tê wateya “çavdêrî, hevdîtin, lêkolîna belgeyan, fişkirin û bikaranîna rêbaza komkirina daneyên wesfî, têgihîn û derketina holê ya bûyerên tevahî (Yıldırım û Şimşek, 2018: 39).

Di sêwirandin û pêkanîna lêkolînê da rêbaza lêkolîna wesfî nermahîyekî lêkolîner peyda dike û karê lêkolîner hêsan dike. Di her qonaxa lêkolînê da nû pêşxistina away û nêzîkatiyan, çêkirina guhertinan di sêwirana lêkolînê da cewhera lêkolîna wesfî çêdike (Karataş, 2015: 64).

Rêbaza lêkolîna wesfî; di lêkolînên zanistî da hejmarî derdikexe pêş û bikaranîna dubarekirina dahuranîyên îstatîstîk ji bo lêkolînekî çendî rêbazeke alternatîf e. Hin dane yan jî agahîyên ku bi lêkolînên kevneşopî nayên berhevkirin, kûrahîya agahîyên bicîanîna rêbazên hevdîtinê, bikaranîna xebatên hurgilî yê çavdêrî an jî lêpîrsîna kûrahîyên analîza wateya naverokê bi rêbaza lêkolîna wesfî tê

berhevkerin. Ji bo nirxandina xebatên di qada edebîyatê da bên kirin ji binbeşa zanistên civakî di maneya zanistî da şopandina pêvajoyeke wesfî çêtir e (Gün, 2018: 18).

Gerdûn û Nimûnekirin

Ji bo bersivandina pirsgirêka lêkolînê û destnîşankirina daneyên pêwîstî pê heye koma mezin a hemû can û bêcanan di nav xwe da dihewîne gerdûn tê gotin. Anku civaka ku em tê da encamên vekolînê gelemper dikin gerdûn e. Nimûnekirin jî di gerdûneke kifş da, hîlbijartinek li gorî hin qeyseyên zelal, bi qebûlkirina temsîlfiyeta gerdûna ku hatiye hîlbijartin ve ji komeke piçûk re tê gotin. Lêkolîn, bi gelemperî li ser koma nimûnekirinê tê kirin û encamên tîn bidestxistin jî ji bo gerdûnê tîn qebûlkirin. Nimûnekirin hemî taybetmendiyên gerdûnê di nav xwe da dihewîne. Mezinbûyîna nimûnekirinê çiqas zêde be belavbûna nimûnekirinê jî ewqas nêzîkê lêkolîna gerdûnê ye (Baştürk û Taştepe, 2013: 129-159).

Gerdûna vê xebatê, romanên Erebe Şemo ne. Ev roman 5 dane ne. Nimûnekirina hatiye dîyarkirin jî romanên Erebe Şemo ne. Anku di vê xebatê da gerdûn û nimûnekirin hevpar in. Lewma hîlbijartina nimûnekirina gerdûnê, di asta herî bilind de hatiye nivîsîn. Di avakirina gerdûn û nimûnekirinê da, romanên Erebe Şemo yê xebat li ser hatine kirin û kunyeya romanên di tabloya 1ê da hatiye nîşandan.

Tablo 1. Kunyeya Romanên Erebê Şemo yê Hatine Lêkolinkirin

H.R	Roman	Kunye
1.	Şivanê Kurmanca	Weşanxanaya Lîs, çapa yekem, Berfanbar 2015, Diyarbakır
2.	Berbang	Weşanxaneyaya Lîs, çapa duyem, Berfanbar 2017, Diyarbakır
3.	Jiyana Bextewar	Weşanxaneyaya Lîs, çapa yekem, Nîsan 2015, Diyarbakır
4.	Dimdim	Weşanxaneyaya Lîs, çapa duyem, Diyarbakır 2016.
5.	Hopo	Weşanxaneyaya Lîs, çapa duyem, Diyarbakır 2016.

Amûrên Komkirina Daneyan

Di vê lêkolînê de, du rêbaz ji bo berhevkirina daneyan hatine bikaranîn. Rêbaza yekem xwendina pirtûkan û destnîşankirina vegotinên têkildar e. Rêbaza duyem jî rêbaza fişan e ku di tomarkirin û senifandina kategoriya daneyan de tê bikaranîn.

Digel ku rêbaza vekolîna belgeyê, ku rêbazek lêkolînê ya wesfî ye, dikare di lêkolînan da bi tena serê xwe jî bê bikaranîn, lê ji bo ku curengiya daneyê jî peyda bike, dikare tevî rêbazên din jî bê bikaranîn. Di lêkolînan da ji bo vekolîna daneyan pirtûk, rêbername, nameşandin, tomar, hûrdem, belgedank, spartek, ezmûn û hwd. dikarin bi dahûrandina belgeyan re bê kirin. Di lêkolîna belgeyê da, ku di vê lêkolînê da hatiye vexwendin, 5 romanên ku di gerdûnê û beşa nimûneyê de hatine nivîsîn, li gorî rêza xwe ya dîrokî hatine xwendin û bêje û komebêjên ku di dema xwendinê de wekî gotinên bi lêvkirina nivîskar hatine nasîn an jî peyvên ku bi îhtîmala hêmanên axaftina nivîskar a bilêvkirineke xweser hatine nasîn, hatine destnîşankirin.

Rêbazêke din ya ku di lêkolîna berhevkirina daneyan da tê bikaranîn, rêbaza tomarkirinê ye. Piştî ku lêkolîner belgeyên girîng bi baldarî lêkolîn dike, divê ku wan daneyên ku ji bo lêkolînê rasterast hewce dike binivîse. Pir girîng e ku di pêvajoya lêkolînê da not bînin girtin. Ji ber ku ew not dikarin di dema nirxandina daneyan de û herwiha di qonaxa ragihandinê de jî bînin bikaranîn. Lewra jî divê ku ew nîşe bi rêkûpêk bînin berhevkin. Di vê qonaxê da rêbaza hêskirina nîşegirtinê, tomarkirina bi fişan e. Her fişek kaxezek piçûk a birêkûpêk û nexşandî ye ku her yek ji wan nîşeyêke taybet li xwe digire. Ev kaxaz, bi gelemperî stûr in û ji kartonên tenik pêk tên. Fişên ku di lêkolînê de hatine bikaranîn, divê hemû xwedî yek pîvanê bin. Bi sedema hilgirtina nîşeyan û hêsanîya hejmara rûpelan, bikaranîna fişan ji ya celebên din gelek kêrhatir e (Karasar, 2002: 39).

Di lêkolînê de, peyv û komepeyvên ku li ser pirtûkan bi rêbaza analîzkirina belgeyê hatine nîşankirin, ji hêla fermannameya tarîxê ve derbasî ser fişan bûne. Ji bo her peyv an komepeyvekê fişek hatiye bikaranîn. Li ser fişê, wateya peyvê, mînakê peyvê û hejmara rûpela peyvê hatiye nivîsandin. Li gel vê pêvajoyê ji her fişekê re hejmarek hatiye dayîn.

Wateyên peyvên bi lêvkirina nivîskar ên di fişan de hatine wergirtin, pêşî di nav ferhengên curbecur hatine lêkolînkirin. Wateya hêmanên axaftina nivîskar yê ku di ferhengan de nehatine dîtin, bi rêya bikaranîna çavkaniyên cuda û şahidên ji herema Serhedê, bi taybetî li Qersê ku cihê jidayîkbûn û mezinbûna Erebe Şemo ye, hatine wergirtin.

Teknîka Hûrnêrîna Daneyan

Mason (1996an ragihand, Gün, 2018: 21) di vê bawerîyê da ye ku divê berî her tiştî lêkolîneke wesfî birêkûpêk be û li gorî ristan bê rêvebirin. Li qasî lêkolînekî çendî çêkirî nebe jî, di encama xebatê da rêbazêke bi keyfî jî nayê bi kar anîn. Bi gotinekî din, xebatên wesfî divê ku di destpêkê da bi stratejîyên dîyarkirî bê birêvebirin.

Mason (1996an ragihand, Gün, 2018: 21) dîyar kirîye ku lêkolînên wesfî di nav rêbazêke dîyarde da bê rêvebirin jî, di heman demê da hêleke wî jî li gorî rewşê nerm dibe. Li ser vê gotinê di encama lêkolîna wesfî da hemî xebatên tên meşandin,

rewşên li gorî xwe taybet di nav xwe da dihewînin û taybetmendiyên ji yê din cudatir hildigirin ser milê xwe. Herwiha her lêkolîneke wesfî, di dahûrîndina daneyan da li gorî rewşa xwe ya taybet divê nêzîkatîyekê dane holê. Lewra taybetmendiyên lêkolînê yê taybet di rewşa dahûrandina daneyan da divê balê bikişîne ser avakirina plana dahûrandina rêbaza daneyên berbiçav.

Ji bo ku mirov di vê lêkolînê da bersivên sereke û pirsgirêkên bingehîn bibînin, daneyên bi rêbazên vekolîna belgeyan û fişkirinê hatin wergirtin, bi van metodên di analîzê da daneyên ku hatine dahûrandin, di hindirê pergalek taybet de pêk hatiye. Ev xebat, li derveyî çarçoveya qonaxa bicîanîna ji çarçoveya bingehîn a plankirî û armanckirî derneketîye. Di pêvajoya bicîanîna plana sêwirandî da, ji rêzê ve pirtûk hatine xwendin û vegotinên lêvkî yê nivîskar hatin destnîşankirin. Piştî ku pirtûk xwendin qediyaye, daxuyaniyên vegotinên devkî yê nivîskar li pey rêza dîrokî ya pirtûkan hatine destnîşankirin û li ser fişên wekhev û standard hatine veguhestin. Ji bo her vegotinek nivîskar yê bi devokeke xweser fişek hate amadekirin.

Piştî ku dane hatine komkirin, agahiyên ku li ser fişan cih digirin, bi rêya bernameya Microsoft Office Excellê bo ser komputerê hatine veguhestin. Gotinên xwerû yê bi devokî yê li ser fişan, di hewirdora kompitirê de hatine dariştin. Di stûnên tabloya têkildar de wesfê vegotinên nivîskar bi kar anîne, wateya wan, çavkanî û hejmara rûpelê ya wateyê, nimûneya vegotinan hatiye bikar anîn.

1. EREBÊ ŞEMO WEŞAN Û LÊKOLÎNÊN TÊKILDAR

1.1. Jîyana Erebê Şemo

Erebê Şemo (Ereb Şamîlov) di 23yê Çirîya Pêşîn a di sala 1897an da li gundê Azatê yê girêdayî bajarê Qersê ji dayîk dibe. Bavê Ereb, Şemo li qezaya Surmeliyê ku berê ew qeza girêdayî welatê Ermanîstanê bû dijiya. Jina Şemo ya yekem li Surmeliyê diçe ber dilovanîya Xwedê. Êdî îdareya Şemo namîne û herdû kurên xwe yên binavên Biro û Derwêşî radike û ji qezaya Surmeliyê koçî bajarê Qersê dike. Ew li gundê Huruman Azatê yê girêdayê Qersê bi cih dibe û li wî gundî bi jineka kurd ra dizewice û Ereb jî li wî gundî tê dinê (Şemo, 2017: 5-6).

Malbata Şemo yêk ji malbatên kurdên Êzidî ya ser bi eşîra Hesenîyan bû. Eşîra Hesenîyan malbateke şêxan a Êzidî bû. Malbata Şemo jî wekî hin ji malbatên din yên şêxan xizan û bê cih û war bûn. Ew tevî malbata xwe gund bi gund digeriyan xulamtiya malên dewletîyan yên kurd, tirk, rûs, ermen û haram dikirin (Boyîk, 2007: 17).

Ereb, kurê Şemo yê sêyem bû. Zarokêkî jîr û zana bû. Gava bavê wî li çolê gavantî dikir, Ereb jî li gel bavê xwe diçû çolê temenê xwe yê piçûk da navê hemû pincar, gul û gihayên xwarekbar hîn dibû. Ew, sala 1908an dema ku hê piçûk bû li gundê Mêleganê dibe xulamê mala Visilyayê dewlemend. Piştî xulamtiya Visilya, li heman gundî bûye paqijkarê dibistana gund. Gava paqijkarîya dibistanê dike nexşeya cîhanê ya li ser dîwarê dibistanê bala wî dikişîne. Gelek bi hûrbînî bala xwe dide wê nexşeyê. Parzemîn, herem û welatên cîhanê baş nas dike. Eleqeya Ereb li hemberî xwendinê her ku diçe zêdetir dibe. Ev rewş, paşê bala mamosteyê dibistanê jî dikişîne. Mamosteyê dibistanê, wî dide ber xwendinê. Keça mamoste Marusya Xanim jî wî fêrî nivîsîn û axaftina zimanê rûsî dike. Ereb di demeke kin da hînî xwendin û nivîsîna zimanê rûsî dibe. Ew hem karê xwe yê xizmetkarîya dibistanê berdewam dike û hem jî di heman dibistanê de xwendina xwe didomîne. Malbata Erebî ji ber ku bê cih û war bûn, li cihên cuda cuda rênçberîya xelkî dikirin. Disa jî ji bo rênçberîyê ji gundê Mêleganê koçî gundê Axdaşê dikin. Erebê ku heta pola pençem xwendîbû neçar dimîne ku dest ji dibistanê berde û tevî malbata xwe ji wî gundî koç bike (Zinar, 2007: 33).

Erebê Şemo di heyama salên 1914-1916an da wekî wergervan li gel rûsan dixebite û di heyama wan salan da bi gelek kesên rûsî yê ku bîr û bawerî û fikra şoreşê di mêjîyê wan da hebû hevaltiyê dike. Erebe ji vê derfetê sûtê digire û bi alîkarîya wan kesan xwe ji hêla xwendinê ve gelekî pêşve dibe. Erebe Şemo di sala 1916an da diçe Sariqamişê û di projeya çêkirina rêya hesinî de dixebite. Li wê derê bolşevîkan nas dike û dikeve nav xebatên wan yê sîxurîyê da. Ji ber xebatên xwe yê di nav bolşevîkan da piştî demeke kurt tê girtin. Piştra jî tê berdand û vedigere gundê xwe û demekê li gundê xwe dimîne. Lê paşê derbasî Rûsyayê dibe û li bajarê Stavropolê bicih dibe. Sala 1918an li wî bajarî dibe endamê Partiya Komînistên Rûsyayê. Erebe Şemo heta sala 1920an li Stavropolê dimîne. Paşê jî diçe bajarê Moskovayê û çar salan di zanîngeha Lazaryan da dixwîne. Di sala 1924an da jî derbasî Ermenistanê dibe (Boyîk, 2007: 19).

Erebê Şemo di navbera salên 1924-1931an da li Ermenistanê di Partiya Komîstên Ermenîyan de dixebite. Paşê jî diçe Lenîngradê û di aspirantûrayê da tê qebûlkirin. Li wir gelek kurdên wekî Îosîf Orbelî, Îsahak Sûkêrman û şagirtê wan Qanadê Kurdo dinase. Bi van kesan ra li ser pîrsgirêkên zimanê kurdî dixebite. Di heman demê de li Enstîtuya Lenîngradê ya Felsefe, Edebîyat û Dîrokê de dersên zimanê kurdî dide (Çaçan, 2007: 27).

Erebê Şemo, bi saya zanîna zimanê rûsî û têkiliyên xwe yê bi partîyên komînist ra, hewl dide ku ciwanên kurd li Rûsyayê di astên bilind yê xwendinê da perwerdê bibînin. Li ser vê esasê jî sala 1928an komeke xwendekarên kurd yê ji Ermenistan û Gurcistanê ji bo xwendinê dişîne Lenîngradê (Gören, 2013: 21).

Dema ku Ermenistan di nav sînorên Sovyetê da hat damezirandin, ji hêla rayedarên wê komarê ve di salên destpêkê da gelek biryarên girîng derheqê pêşxistina çanda kurdan va tên girtin (Serdar, 2017: 6).

Di destpêka damezirandina Komara Ermenistan a Sovyetê da, Serokatîya Komarê biryar dide ku di gundên Kurdan da zimanê kurdî li dibistanan bê xwendin. Hikumata Ermenistanê di sala 1927an de biryara dariştina alfabeyê jî ji bo zimanê kurdî dide. Lewra jî Îshak Maragulov û Erebe Şemo ji bo wî karî tên peywirdarkirin. Erebe Şemo û Îshak Maragulov alfabeyeke latînî ya nêzî alfabeya Celaddet Elî

Bedirxanî amade dikin. Paşê ew xebata wan di jêr navê “Wxe Wxe Hînkirina Zimanê Kurdî” da tê çapkirin. Di sala 1929an da Îshak Maragulov û Erebe Şemo ji bo xwendin û nivîsandina kesên mezin wê alfabeyê derdixin. Dûre jî Îshak Maragulov û Rûbên Drambyan ji bo şagirtên dibistanan, pirtûka bi navê “Ronayî”yê derdixin (Serdar, 2017: 6).

Di heman demê da jî Erebe Şemo û Îshak Maragulov di dibistanên gundên kurdan da wê alfabeyê didin hînkirin. Kurdên wê demê bi giştî çiyayî û koçber bûn, lewra jî xwendin û nivîsîn di nava wan da gelek kêr bûye. Ji bo ew rewş were guhertin, hewceyîya wan bi rojnameyekê jî çêdibe. Di sala 1930an de rojnameya “Rîya Taze” li Ermenistanê dest bi weşana xwe dike. Erebe Şemo di weşandina rojnameya Rîya Taze de jî roleke mezin dilîze (Gören, 2013: 20).

Erebe Şemo, di sala 1934an da konferansa Kurdolojîyê ya li Erîvanê li dar dixê. Sala 1930an jî romana xwe ya bi navê “Şivanê Kurmanca” dinivîse. Ev berhem dibe yekem romana ku bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn. Erebe Şemo li gel nivîsîna wê romanê mafê “Bavê Romana Kurdî” distîne (Reşan, 2008: 144).

Di dawîya salên 1930î da li welatê Sovyetê dîktatorîya Stalînî dest pê dike. Bi milyonan kesên bê tawan ji welatên xwe surgunê Sibîryayê tên kirin. Erebe Şemo jî yek ji wan kesan bû. Di sala 1937an de Erebe Şemo ji aliye desthilatdarîya Stalînî ve li Lenîngradê tê girtin û wî dibin Sibîryayê (Boyîk, 2007: 20).

Erebe Şemo, di sala 1956an de anku piştî mirina Stalînî cardin vedigere Ermenistanê. 22-23 sal bi ser nivîsîna romana Şivanê Kurmancan da derbas bûbûn. Sala 1957an romana “Berbang” û sala 1959an jî romana xwe ya bi navê “Jîyana Bextewar” dinivîse. Romana wî ya bi navê “Kela Dimdimê” sala 1966an li Yerîvanê bi tîpên Kirilî tê weşandin. Herwiha ew roman sala 1974an li Moskovayê bi tercumeya rûsî, sala 1975an li Bexdayê bi şêwezara Soranî û sala 1983an jî li Stockholmê bi kurmancîya latînî tê weşandin. Şemo sala 1967an li Moskovayê berhevoka xwe “Hîkayetên Gelê Kurd” û romana xwe ya bi navê “Jîyana Bextewar” diweşîne. Sala 1969an jî romana xwe ya dawî a bi navê “Hopo” dinivîse (Zinar, 2007: 35).

Erebê Şemo, di sala 1978an de li Yerîvanê diçe ser dilovanîya xwedê. Niha li ser dîwarê mala ku Erebê Şemo lê dima, li ser keviyekî mermerî bi zimanê rûsî wiha hatiye nexşkirin: “Di vê malê da nivîskarê Kurd, bolşevîkê kevin, xebatkarê civatê yê navdar Erebê Şemo Şemîlov, jiyaye” (Xelil, 2007: 29).

1.2. Berhemên Erebê Şemo

Yekem romanivîsê kurd Erebê Şemo; li ser hin mijaran di hin cureyan de berhem afirandine. Berhemên ku cureya wan cuda yên ji hêla Erebê Şemo ve hatine nivîsîn li jêr hatine rêz kirin. .

a. Roman

- Şivanê Kurmanca: Di sala 1931an de cara pêşî bi rûsî bi navê Kurdiskî Pastûx (Şivanê Kurd) li Lenîngradê tê nivîsîn û piştê tê çap kirin.. Lê nivîskar vê berhemê di sala 1935an de ji nû ve bi kurdî dinivîse. Ev xebata bi kurdî ye ne wergera çapa rûsî ye, xebateke orjînal e. Çapa bi rûsî hatiye nivîsîn ji 64 rûpelan pêk tê lê bele çapa bi kurdî hatiye nivîsîn ji 155 rûpelan pêk tê.
- Berbang: Di sala 1957an li Eremenistanê tê nivîsîn û çapkirin.
- Jîyana Bextewar: Di sala 1959an tê nivîsîn û piştê tê çap kirin.
- Kela Dimdim: Di sala 1966an li Yerîvanê bi tîpên Kirilî tê weşandin. Herwiha ew roman di sala 1974an li Moskovayê bi tercumeya rûsî, di sala 1975an li Bexdayê bi şêweza Soranî û di sala 1983an jî li Stockholmê bi kurmancîya latînî tê weşandin
- Hopo: Di sala 1969an li Ermenistanê dinivîse. (Zinar, 2007: 35).

b. Berhevok

- Hîkayetên Gelê Kurd: Di sala 1967an de li Moskovayê dinivîse.

c. Nivîs

- Emirê Lenîn: Di sala 1930an de bi awayekî biyografîk li ser jîyana pêşengê Sosyalîzmê Lenîn hatiye nivîsîn.

- Terîqa Rêvolûsya Oktobirê: Di sala 1930an de li Ermenistanê li ser pêvajoya Şoreşa Cotmehê hatîye nivîsîn.
- Kolxoz û Kara Wî ji Gundiya re: Di sala 1930an de nivîsandîye.
- Li ser Pêwendiyên Fêodalî di Nav Kurdan de: Di sala 1936an de li ser pêwendiyên fêodalî di nav kurdan de li Ermenistanê nivîsîye.
- Kurmancêd Elegezê: Di sala 1936an de li Ermenistanê nivîsîye.

d. Şano

- Koçeke Derewîn: Şanoya bi navê “Koçeke Derewîn” di sala 1930an de li Ermenistanê, nivîsandîye.

(https://tr.wikipedia.org/wiki/Ereb%C3%AA_%C5%9Eemo.09.10.2021)

Li ser hejmara berhemên Erebe Şemo û zelalnekirina lehengên di romanên wî da hin şîroveyan cuda jî hatine kirin.

Yeşilmen (2017: 125-146) dibêje, eger em “Şivanê Kurmanca” û “Berbang” wekî du romanên cuda bihesibînin û “Kurdên Elegezê” jî wekî roman qebûl bikin li ber destê me şeş roman hene. Lê Erebe Şemo di axaftina xwe ya li gel Bavê Nazê da dibêje: “Min heft roman, çend kurte çîrok, hin şano nivîsandine”.

Derheqê nakokîyan di nava romanên wî da jî Çoban (2017: 105-122) dibêje, “Jîyana Bextewar” ne berhemekî otobîyografî be jî Erebe Şemo di hin cihan da xwe dide dest ku lehengê romanê an ku Misto, ew bi xwe ye. Misto jî jîyaneke wekî ya Erebi jîyaye. Ew jî gelek zimanan dizane, berdevkîya rûsan kirîye û li gel bolşevîkan jî bûye heval. Dîsa dibêje; lehengên romanên Şivanê Kurmanca û Berbenag jî Erebi bi xwe ye.

1.3 Kesayetîya Erebe Şemo ya Edebî

Civaka Erebe Şemo pê re dijîya civaka kurd, adirbêcan, hurum, ermen, tirk û molokan bû. Malbata Şemo malbateke feqîr bû. Ji bo kar û debara xwe havînan li gundên van netewan diçûn ber dewaran, zivistanan jî di wan gundan da xulamî û

xizmetkarî dikirin. Ji wan malbatan gelek jî kurmancî nedizanîn lewra jî Ereb û malbata xwe mecbûr diman zimanê wan hîn dibûn. Ereb hêj ne geheştî 15 salîya xwe zimanê rûsî, ermenî, tirkî û hurumî gelek baş hîn dibe. Herwiha ew hînî dab û nerît û rabûn û rûniştina wan netewan jî dibe. Ev realîte li ser kesayeta wî ya edebî gelek bandorê dike û paşê jî wê bandorê di romanên xwe da nîşan dide (Boyîk, 2007: 17-18).

Sedsala Erebê Şemo ji dayîk dibe sedsala 20î bû. Şerê Cihanê yê Yekem dest pê dike. Li enîyekê şer li enîyê din jî şoreş bû. Aloziyên Şerê Cihanê yê Yekem û Şoreşa Cotmehê hêj neqedîya bûn, Şerê Cihanê yê Duyem jî dest pê dike. Rewş awarte ye. Pergala heyî hilweşîyaye, pergalake nû jî hêj ava nebûye; guherîneke bi lez û bez heye. Erebê Şemo jî di nav vê gengeşeyê de mezin dibe û dibe şahidê dewr û dema xwe. Ji gelek hêlan ve rewşa civakî ya wê demê girtiye dest û ragihandîye xwendevanên xwe. Tenê rewş tespît nekiriye her wisa sedemên pirsgrêkan jî gotîye û rêya çareserîyê jî nîşan daye (Baqir, 2007: 47).

Di serdema ku Erebê Şemo ji dayîk dibe, civaka rûsî jî di nava gengeşîyeke mezin da derbas dibû. Amadekarîyên ji bo têkoşîna Şoreşa Cotmehê berdewam dikirin. Ji alîyê din ve jî herema Ereb lê dima, gel di bin zordarîya axa, şêx û began da bû. Lewra jî ev serdem bi taybetî ji bo kesên xizan gelek zor û zehmet bû. Desthilatdaran keda wan dixwar û bixwe jî di nav kêf û şahîyê da dijîyan. Lê kesên xizan û gundî di nav feqîrî, zor û zehmetîyê de bûn. Ew gengeşî li ser Erebê Şemo, bandoreke piralî dike. Ew hem şahidê wan bûyeran bû û hem jî bi awayeke rasterast ev neheqî û zordestî li wî jî dihat kirin. Erebê Şemo di vê rêçê da civata kurdan baş nas dike. Tiştên ku bi çavên xwe dibîne û bi guhên xwe dibihîze zeft dike û dike malê mêjuya xwe. Ji ber vê jî di romanên wî de ev kûrahî baş tê xuyakirin (Gören, 2013: 23).

Ji alîyê perwerdeya resen ve Erebê Şemo xwendineke klasîk nedîtîye. Dema ku malbata wî di li gundê Molokanan dibin rênçber, Ereb jî di heman gundî da dibe berdestkê mamosteya dibistana gund. Di wê dibistanê da cara pêşî têkilîya Ereb bi xwendin û nivîsandinê re çêdibe. Ereb di wê dibistanê da fêrî xwendin û nivîsîna zimanê rûsî dibe. Di sala 1914an dema ku Şerê Yekem ê Cihanê dest pê dike, Ereb ji ber ku zimanê tirkî û rûsî baş dizanî, li heman heremê dest bi wergervanîya ordîya

Rûsan dike. Ew wê demê bi gelek kesên Rûsî yên xwedî bîr û bawerî û fikrên şoreşê ra hevaltîyê dike. Û di jêr bandora wan têkilîyan da xwe ji hêla bîr û bawerîyê ve gelekî pêş ve dibe. Piştî sala 1916an ji bo debara xwe diçe Sarîqamişê û di çêkirina rêya hesinî de dixebite. Li wê derê bolşevîkan nas dike û ji alîyê mejuyî ve fikra wî tê guhertîn. Piştî ku ew fikir pê re çê dibe (fikra Şoreşa Oktoberê) bi dildarî dikeve nava xebatên wan ên sîxûrîyê da. Ev fikir û bawerî li ser jîyana wî ya edebî rêçikekî xîz dike û heta dawîya emrê xwe jî pê vê rêçikê diçe (Boyîk, 2007: 19).

Erebê Şemo nivîskarek bû ku ji welatê xwe hatibû mişextkirin. Ew di nav sînoren dewletên Sovyetê da dima. Mayîna wî ya di nava wan sînoran da û dûrbûyîna wî ya ji welatî, ew xistibû nav fikreke cuda. Erebe Şemo jî di axaftineke xwe da wê fikra xwe piştrast dike û wiha tîne ziman: “Serfirazîya ordîya sor û hukmê sovyetê ji hemûyan bêtir min kêfxweş dike. Ev xelasîya me feqîr, fuqara û milletên piçûk bû. Serfinazîya şerê wetanîyê yê nazîyên dijî Hîtlêr ji me hemûyan bê hesap şa kir.” Dîsa gotina xwe berdewam dike û dibêje: “Ez kominîstekî kevn im û bi kominîstîya xwe jî kubar im” (Kendal, 1978: 22).

Li ser vê bingehê, gelek nivîskar û rewşenbîrên kurd wî bi vî şeklî rexne dikin û dinirxînin.

Yusuf (2011: 61-62) hersê navên sereke yên ji hersê deverên cuda wekî Erebe Şemo, Rehîmê Qazî û Îbrahîm Ehmed wiha dinirxîne: Gava mirov pêvajoya wêjeya kurdî ya di navbera salên 1930 û 1980î dinêre, yekemîn xala ku bala mirov dikişîne ew e wêje bi temamî ji nav kûrahîya siyasetê derketîye. Çavkanîyên vê dîyardeyê xwe dispêrin paşxaneyê dîrokî, erdnîgarî, civakî û sîyasî ya ku rewşa kurdan û perçebûna Kurdistanê di nav çar dewletan da bi xwe re anî bû. Bi awayekî ku kurd di nav şêwezar, millet û dewletên cuda da hatibûn parvekirin. Hemû hewildanên wan ên dîrokî, siyasî, civakî û wêjeyî û roman jî di nav da, tenê ji bo bi destxistina mafên wan ên rewşa bûn. Li Başûrî ji sala 1961ê heta 1975an şoreşa Mela Mistefa Barzanî berdewam kiribû. Li Rojhilatî damezrandina Komera Kurdistanê çêbibû û kurdên li Kafkasyayê jî di jêr bandora ramanên Şoreşa Oktobera 1917an û damezrandina Sovyetê da mabûn.

Çoban (2017: 105-122) di gotara xwe da Erebe Şemo di çarçoveya helwesta

wêjeya Kafkasyayê û Şoreşa Cotmehê a 1917an da dinîrxîne û dibêje: Sala 1917an û piştî Şoreşa Oktoberê li Yekitîya Komerên Sosyalîst ên Sovyetê, hikûmeta nû dest bi xebatên xwe yên çandî dike û di sala 1934an da yekemîn Kongreya Yekitîyên Sovyetê tê lidarxistin. Di wê kongreyê da Realîzma Sosyalîst wekî nêrîna fermî ya dewletê tê destnîşankirin. Nivîskarên Sovyetê berhemên xwe li ser vê rêgezê diafirandin. Teoriya Realîzma Sosyalîst bûbû rêgezekî bingeîn. Li gorî wê teorîyê divê ku nivîskar hişê civatê ava bike, li hemberî dagirkarîyê serî rake û xelkê bi rê ve bibe. Realîzma Sosyalîstê li ser çend xalan pêk tê û yek ji van xalan jî lehengên erênî ne. Ew leheng bi awayekî şoreşger tev digerin û dizivirin.

Kurdên sovyetê jî li ser bingeha Realîzma Sosyalîstê berhemên xwe nivîsandine. Şayesandina lehengên romanên Erebe Şemo wekî xetên reş û spî tîn xuyakirin. Dewlemendên romanên axa, beg û qeymeqamên dewletê, hertim wekî lehengên neyînî tîne nîşandan. Lehengên erênî jî şoreşger in. Tevî ku zilm û zorê dibînin, dîsa jî dest ji xebata xwe bernadin, xebata xwe bi awayeke jixwe bawer berdewam dikin û dawîyê jî bi ser dikevin.

Alan (2013:183-191) Erebe Şemo, wekî kominîstekî bawermend pênase dike. Nivîskar dibêje ku Şemo bi fermana Stalînî 19 salan ji bo Sibîryayê tê sirgûnkirin û piştî mirina Stalînî ew cardin vedigere Ermenistanê. Dîsa jî dev ji erka xwe ya Realîzma Sosyalîzmê bernade û li ser heman helwestê berhemên xwe yên bi navê “Berbang” “Jîyana Bextewar”, “Hopo” û “Kela Dimdim” dinivîse.

1.4. Weşan û Lêkolînên Têkildar

1.4.1. Hin Weşan û Lêkolînên li ser Kesayetîya Erebe Şemo ya Edebî

Hatine Kirin

Di bin navê vê sernavê de, hin weşan û lêkolînên ku derbarê xebatên Erebe Şemo da pêk hatine, cih digire.

Polat (2007: 37-39) gotara xwe ya bi navê “Ji Alîyê Teknîka Romanê ve Dimdim” cih daye bikaranîna teknîka di romana “Dimdim” pê hatiye nivîsîn. Dibêje, Romana “Dimdim”; her çiqas zimanê wê herikbar, hêsan û bûyer bi hev ve xweş hatibin honandin û di nav romanê da evîndarî, vegotina xwezayê, hestên welatparêzî xweş hatibin nexşandin jî ji alîyê teknîka romana nûjen ve kêmasîyên wî hene. Diyalog kê mîna, bûyer zêde ne û danasîna kesan jî pir hêsan hatiye pêk anîn.

Roj (2007: 39-41) di gotara xwe ya bi sernavê “Pirên Şikestî Îzolasyona Gewr”ê da, bandora Erebe Şemo ya li ser nifşên nû bi tîkiliya sê awayên herikîna wêjeya Kurmancî ya Bakûr, Ewrûpa û Kafkasyayê ya bi rabirdûyê ve girêdayî nirxandîye. Li gorî nivîskarî, awayê yekem wiha ye: Serdema Ehmedê Xanê û heta digihe Hekar û Cegerxwîn xwe li edebîyata pêşîya xwe girtine û rê li wêjevanên pêşîya xwe zêde kirine. Edebîyata kurmancî ya li Ewrûpa jî bingeha heyî û derfetên rabirdûyê ji xwe re ne kirine xem. Her gav xwestine bi xwe bibin bingeh û ji bo edebîyata Kafkasyayê jî wiha dibêje: Edebîyata Kafkasyayê di nav rewşên xerab da mûmên xwe pê xistine. Ew kesên ku ji welatê xwe hatine sirgûnkirin, jîyan û çanda xwe jî bi xwe re birine, di nav welatên mezin da welatên piçûk ji xwe ra ava kirine. Wan bi xwe ji xwe ra bingeha edebîyatê ava kirine. Ji ber şert û mercên xirab ên ku wan di nav da jîyan dikir, haya wan ji edebîyata pêşîya wan çê nedibû. Wêjeya rabirdûyê ji xwe ra nekirine bingeh. Ji ber vê yekê edebîyata kurdên Kafkasyayê wekî ya neteweyî li ser xakekî xîk û xalî ava bûye. Ev fikir bi temamî fikrekî xwerû ya nû bû.

Denîz (2007: 43-47) di nivîsa xwe ya bi navê “Her Ew Hesret û Ew Xwezî” da cih dide naveroka romanên Erebe Şemo. Ew dibêje ku Erebe Şemo di naveroka romanên xwe da ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîr û şahîyan, her tişt vegotîye. Dab û nerîtên kurdan ên girîng yek bi yek tomar kiriye.

Nivîskar dibêje qey Ereb nexwestîye ew kevneşopî bîn jibîrkirin. Mijarên ku bûne bingeha dariştina romanên wî, nivîskar digihejîne encama civakek hiyerarşik. Bi hin şert û mercan gel bi tebeqeyan ji hev hatiye veqetandin. Di navbera gel û serdestan da sînor hatine xêzkirin. Dibêje; dewletên serdest li ser her kesî û her tiştî de ne. Li derheq tebeqeyên jêrtir çî dixwazin dikin an jî didin kirin. Di jêr dewletê da çîn û tebeqeya begên kurdan heye. Ew çîn jî ji hêla kedxwarinê ve ji dewletê ne kêmtir e. Her yek ji wan xwedîyê çend kerî pez e. Ew dewlemend û xwedan gund in. Havînan ji bo xwedîkirina kerîyên pezên xwe şivanan digirin. Zivistanan jî karê wan yê malê ji alîyê gundîyan ve tê kirin. Bi hişê dewletê radibin û rûdinin. Hêza xwe jî ji dewletê digirin. Piştî wan began çîna dewlemendan heye. Ew bi rêya bazirganî û selexuriyê dewlemend bûne. Di rojên tengasîyê da keysî li gel dibînin û malê xwe bi bihayeke giran difiroşine wan. Tiştên ku li beranber malê xwe jî werdigirtin bi buhayeke erzan ji wan distandin. Di jêr çîna dewlemendan da jî çîna xweşhalan heye. Ev tebeqeya gelî jî dewlemend in. Di tevgerên xwe da di bin bandora herdu alîyên jêr û jor da dimînin. Li gorî hezê alî diguherin. Çîna ku herî zêde nêzî feqîran e ew çîn e. Di qata herî jêr da jî çîna feqîr heye. Di civakê da çîna ku hejmara wê ji hemûyan zêdetir jî ew e. Zor û zehmetî hertim para wan e. Lê ji her tiştî bêpar in. Di şer da ew li pêş in. Bac û xeracên herî zêde jî ew didin. Nivîskar, yek bi yek romanên Erebê Şemo xwendine xwe gihandîye encameke bi wî awayî. Ew dibêje ku xwezî û daxwaza Erebê Şemo her ew xwezî û daxwaz e ku mafê her mirov û gelekî ye, anku jîyaneke bextewar.

Baqir (2007: 47-48) di gotara xwe ya bi sernavê “Ji Şivantiyê Ber bi Zanyariyê ve” da balê dikişîne ser wan nivîskar û rewşenbîrên kurd ên ku heta niha bi rêya berhemên biyanîyan ve hatine nasandin. Ew dibêje ku em bi rêya berhemên biyanîyan jîyana rewşenbîr û zanyarên xwe dinasin. Heta demeke nêz wan kesan çanda kurdî nedîtine û nejiyane û tenê bi hizrên xwe danasîna nivîskar û rewşenbîrên kurd kirine û bi me dane nasandin. Îro şert û merc hatine guhertîn. Divê ji îro û pêve kurdek derbarê jîyan û berhemên rewşenbîr û nivîskarên xwe da lêkolîn bike û berheman binivîse. Ew herwiha balê dikişîne ser dewletên desthilatdar û wiha berdewam dike: dewletên desthilatdar li gorî daxwazên xwe civakê bi rêve dibin û xebatên xwe dimeşînin. Hertim berhemên dîrokî, wêjeyî, çandî, û yên civakî bi destê desthilatdaran hatine nivîsandin. Nivîskar dibêje mînakên herî ber bi çav mînakên

dema serdestîya ola îslamê ne. Pêwîst bû ku berhemên wê serdemê tenê pesnê nîrxên ola îslamê û nijeda ereban daban. Dema ku qala doza kurdan an neteweke din hatiba kirin an jî mijareke têkildarî çanda wan di nava berhemekê da cih bigirta, pêwîst bû ku ew berhem ji holê hatiba rakirin. Ew pergala heta dawîya serdema Osmanîyan jî berdewam bû. Erebe Şemo yek ji wan kesên berxwedêr bûye ku dawîya serdema Osmanîyan jîyaye. Ji ber ku wî jî gelek êş û zordariya dewleta Osmanîyan dîtiye, di berhemên xwe da wan serpehatiyên kurdan baş tîne ziman.

Nivîskar derheq naveroka berhemên Erebe Şemo da dibêje ku ew baş hînê êş û zehmetiyên kurdan bûye û lêkolîn li ser wan kirîye. Erebe Şemo bi zimanê gelî berhemên xwe afirandine. Gel çawa axaftîye, wî jî wisa nivîsandiye. Tevî ku di berhemên wî da devoka serhedê serdest be jî peyvên kurmanciya jêrîn jî di nava wan berhemên da cih digirin. Nivîskarî, di warê rêzimanê da jî çend kêmasiyên berhemên Şemoyî tespît kirine. Ew dibêje ku Erebe şemo ji hêla peyvsaziyê jî çarçoveya rêzimanê derketîye.

Celalî (2014: 72-76) di gotara xwe ya bi navê “Di Romanên Erebe Şemo Jiyana Bextewar û Hopa da Tîpên Şoreşker Ên Romantîk” da mijara rola romanê di dîroka neteweyên cîhanê da daye ber çavên xwe. Wî di vê çarçoveyê da nîrxandina du romanên Erebe Şemo yên bi navê “Jiyana Bextewar” û “Hopo”yê kirîye. Nivîskar dibêje ku gava di sedsala 17an da netewe-dewlet di jêr desthilatdariya împaratoriyan da li ser rûyê cîhanê derdikevin, gel jî bi afirandina wêjeyê modern xwe ji wêjeya klasîk rizgar dîkin. Ji ber vê çendê jî, dema ku di sedsala 20an da nexşeyê cîhanê dîyar dibe, di vê pêvajoyê da rola romanê jî hebûya. Nivîskar herwiha dibêje ku gava netewedewletekî serxwebûna xwe bi dest dixist, ji bo wergerandina klasîkên cîhanê bo ser zimanê xwe yê fermî, saziyên taybet ava dikirin. Lê ji bo kurdan ev rol ketibû ser milê kesayetiyên xweser. Erebe Şemo jî yek ji wan kesan e ku bi romana “Şivanekî Kurmanc” xwestiye rê li ber kurmancan vekin da ku derbasî wêjeya modern bibin.

Di romana Erebe Şemo ya bi navê “Jiyana Bextewar” da li şûna peyva kurd, bêjeya “kurmanc” hatiye bikaranîn. Lê di romana “Hopo” da peyva kurd gelek hatiye bikaranîn. Di romana “Jiyana Bextewar” da dîmenê gundekî serhedê teswîr dîke û herwiha behsa jîyan û edetên kurdan dîke. Di romana “Hopo”yê da jî ev rêç herikîye û bi dawî bûya.

Di herdu romanen da kurd ji bo dewletê da canê xwe didin. Ew li hemberê daşnakan, axan, kapitalîstan û emperyalîstan ji bo Sovyetê şer dikin, dibin eskerên sor, dikujin, birîndar dibin û tîna kuştin. Hemû hebûna wan bi komunîzmê ve girêdayî ye.

Çoban (2017: 105-122) di gotara “Li Pey Şopên Lehengên Erênî û Şoreşger di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de” da ku me li jor jî amaje pê kiribû, 5 romanên Erebe Şemo di helwesta wêjeya Kafkasyayê ya bi Şoreşa Oktober’a 1917an da dinîrxîne. Ew di serî da li ser tiştên ku bi vê şoreşê ra hetine qebûlkirin disekine û nêrîna xwe wiha tîne ziman: Realîzma sosyalîst bi şoreşa 1917an dibe nêrîna fermî ya dewletê. Realîzma sosyalîst li ser çend xalan rû dide û yek ji van xalan jî lehengên erênî ne. Ev leheng bi awayekî şoreşger tevdigerin û dizivirin.

Lehengê romanên Erebe Şemo di romanên “Şivanê Kurmaca” û “Berbang”î da Erebe bi xwe ye. Lehengê romana “Jiyana Bextewar” “Misto” ye. Lehengê romana “Hopo” navê wî yê rastî “Ûsiv” e, lê dîsa jî wekî “Hopo” tê binavkirin. Herwiha lehengê sereke yê romana “Dimdim”ê “Xanoyê Çengzêrîn” e. Taybetmendiyên wan lehengan ew e ku bi giştî di nav çerçoveya lehengên remza şoreşger ên realîzma sosyalîst de erênî ne. Ev leheng şoreşger in, hurgilîya wan ya psikolojîk tune. Tenê serdestîya wan an jî bindestîya wan giring e. Rewşa wan ya li hemberî partîyê an jî li hemberî burjuvazîyê dîyar dike ka gelo ew xirab in an baş in. Ew çî zilm û zorê dibînin, dîsa jî dev ji erka xwe bernadin û dawîyê da jî bi ser dikevin.

Yeşilmen (2017: 125-146) di nivîsa xwe ya bi navê “Têkilîyên Kurd û Ermenîyan di Romanên Erebe Şemo de” li ser 5 romanên Erebe Şemo lêkolîn kirîye û çavkanîya romana kurdî ya li Kafkasyayê dîyar kiriye. Piştra mijara lêkolîna xwe teng kiriye û têkilîya Kurdan û Ermenîyan derxistîye holê. Nivîskar ji bo çavkanîya romana Kurdên Kafkasyayê dibêje ku romana wê serdemê bi hemdê xwe, di emcama paşxaneyê wêjeya kurdî da derneketîye holê. Ew dîyarde me digihîne wêjeya Kafkasyayê. Ji ber ku kurdên di wê serdemê li Kafkasyayê dijîyan, ji mirinê rizgar bûbûn. Gelek ji wan di rê da miribûn. Yê ji wê bobelatê rizgar bûbûn, di jêr şertên giran da li sêwîxaneyan mezin bûbûn. Kurdên wê heyamê xwende nebûn. Heya wê çaxê piranîya wan şivan û gavan bûn. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje ku îdeolojîya Realîsta Sosyalîst ji bo kurdan qederek bû ku xwe pê gihandibûn. Ne bi

hemdê xwe hîlbijartinek bû ji bo wan. Wan ji ber ku paşxaneyêke hizrî tune bû û ji hêla bawerîyê îdeolojîk ve bêbingeh bûn, bawerî bi wê îdeolojîyê anîbûn. Herwiha nivîskar dibêje ku wêjeyekî ku bêbingeh be li îdeolojîyê digire û xizmeta wê îdeolojîyê jî dike. Wêjeya kurdên Kafkasyayê jî bi wî şeklî derdikeve pêşberî mirov.

Nivîskar, piştî ku bingeha romana Kurdên Kafkasyayê şîrove dike, mijara lêkolîna xwe jî teng dike û dikeve nav romanên Erebe Şemo û têkiliya wan ya bi ermaniyan re jî wiha şîrove dike: Erebe Şemo, di her du romanên xwe yên pêşî da wekî çaveke çînî li Ermeniyan dinêre. Lê di romanên din da ev bawerî diguhere behsa yekqederî û dostaniya Kurdan û Eremenîyan dike. Dibêje; Erebe Şemo regekî neteweyî derxistîye holê. Wî di romana “Kurdên Elegezê” da tu karakterên biyanî bikar neanîne. Ew bi taybetî behsa Ermeniyan dike û berxwedana wan ya li hemberî çîna dewlemend ji xwe re wek model nîşan dide.

Nivîskar cardin, di romana “Jîyana Berxtewar” da bi rêya diyalogekê tekîliya Kurdan û Ermeniyan nîşan dide. Di diyaloga “Emerîk” û “Silêman Begî” da ku lehengên romanê ne, Emerîk dibêje: Nizanim kurd çima ji Ermeniyan hez dikin? Nizanim kurd çima dibin kirîvê Ermenîyan? Di vê romana Erebe Şemo da “Silêman Beg” tevî ku lehengek neyînî ye, lê dîsa bi çavekî çînî li Ermenîyan dinêre. Ew hemî Ermeniyan wekî dost û kîrîv nîşan dide. Erebe Şemo dîsa di vê romanê da qedera Kurd û Ermenan wekhev nîşan dide. Di şer û pevçûnan da wan di çeperekê da şer kirine. Ji ber ku her du netew bi hev ra ji cih û warê bûne. Di romana “Hopo”yê da jî sêwirandina rewşê dişibe naveroka romana “Jîyana Bextewar”. Ermenî civakek zana û pêşketî ne di warê romanê da. Ew jî li dijî feodalîzmê derdikevin.

Romana “Hopo” bi xetên spî û reş hatiye xêz kirin. Jîyana di nav Osmanîyan da wekî jîyaneke nexweş, zehmet û di bin zordariyê de nîşan dide, lê ji aliyê din ve, jîyana aram û buhiştî ya serdema Sovyetê ya bi Ermeniyan re tîne ziman.

Di romanan da em tenê dikarin Ermeniyan wekî leheng bibînin. Nivîskarê gotarê dibêje ku ew jî ne karakterên ji zanîna me dîr in ku di romanan da têne şayesandin. Kurd herî zêde bawerîyê bi wan dikin. Ew kirîvê kurdan in. Zana û jîr in. Nivîskar dibêje, di romanên Erebe Şemo da neteweyên din jî berovajî Ermeniyan tîne nîşandan.

Sartık (2014: 84-86) jî di gotara xwe ya bi sernavê “Taybetîya Romannûsîya Kurdên Qafkasyayê” da li ser helwesta romannûsîya nivîskarên kurd ên Kafkayayê disekine. Ew nivîskarên wekî Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Elîyê Evdirehman û hwd., bi îdeolojîya Realîsta Sosyalîst ve girê dide û derheq vê mijarê de çend xalan destnîşan dike:

1. Nivîskarên vê serdemê lehengên erênî diafirandin û romanên xwe li gorî metoda çavkanîyan didîtin.
2. Di romanên da jîyana kolxozîyê şênber e.
3. Yekitîya Sovyetê hemû gelan wekhev dibîne û wan hambêz dike. Ev nêrîn ji bo gelên bindest dibe hêvîya azadbûyînê. Ji ber vê yekê jî gel xwe didin alîyê wê rejîmê. Ji bo kurdan jî heman tişt derbasdar û girîng e. Ji ber ku welatê Kafkasîyayê ji bo wan dibe welatê duyem. Bi gelemperî di romanên wan da pesnê rêberê Şoreşa Oktobirê Lenînî û bolşevîkan tê dayîn.
4. Eşq ji bo xizmeta gel hertim têk diçe.
5. Çiyayên Kurdistanê, gund û warên kurdan, jîyana zozanan, mihrîcanên çandî û dînî yên êzidîyan, trajedîyên ji bûyerên absurt derketine hemû di romanên da cih digirin.
6. Di romanên de nêrînên li ser jinan, kevneşopîyên bêfeyde û bawerîyên pûç ên xelet ku di nav civaka kurdan da hene di romanên da tîr guherîn û bi birdozîya sosyalîzmê ve tîr girêdan.

2. HELWEST Û FERHENGOKA ROMANÊN EREBÊ ŞEMO

1. Helwesta Romanên Erebê Şemo

Di vê beşa lêkolînê da, helwesta romanên Erebê Şemo û encamên ku piştî komkirin û analîzkirina daneyên hatine bidestxistin bi awayê ferhengokek piçûk di tabloyan de hatine pêşkeş kirin.

Erebê Şemo romanên xwe bi helwesta Realîzma Sosyalîzmê nivîsandine.

Realizm, ji realê peyda bûye yanî xwe digîhîne peyvên wekî rast, eslî, heqîqî, neguhêzbar û çalak. Koka peyva realîteyê bi eslê xwe ji realîteya Latînî derketîye û belav bûye. Wateya bêalîtiyê û rastîya jîyanê li xwe bar dike. Li Fransayê jî ev peyv bi realite tê binavkirin. Piştî li gelek welatên cîhanê jî heman peyv hatiye bilêvkirin. Di heman demê de peyva realîzmê bûye navê tevgerê hunerî. Ev tevger, jîyanê, xwezayê, bûyeran û mirovan di eslê xwe da wekî xwe dihêle û wan xwezayî û bînirxandin nîşan dide. Anku realizm, bi tecrûbeyan jîyanê neguhêzbar bi rastîyan radigîhîne berçavê mirov. Bi awayekî din realizm li ser bingeha romantîzma bi eslê xwe ji rastîyê dûr hatiye avakirin (Akdağ, 2019: 3-4).

Romana Realîst, romanekî vegêr e. Vegêr, anku nivîskar romanê diafirinê û di heman romanê de jî dibe lehengê romanê yê sereke. Di romana realîte de haya vegêr ji xeyala romanê nîne û nizane ku realite xeyalî ye. Ji ber vê yekê romanê bi mentiqî rê ve dibe. Kirdeya romanê burjuvazî ye, mijara wê jî malbatekî piçûk a ji civakê ye. Ji bo vê romanê tecrûbeyên malbatê girîng in. Jîyana wê malbatê jî pêvajoyek e ku di xeyalê de dest pê dike, mezin dibe û diqede. Li ser jîyana wê malbatê rastîyên gelemperî hewce dikin. Di heman demê de ji bo vê malbatê bawerîyeke giştî jî heye. Ji ber van sedeman di rola malbatekî piçûk de civakek dikare bê gelemper kirin. Çinku ev malbat hemû rastîyên civakê di rola xwe ya piçûk de nîşan dide (Aylanç, 2016: 2).

Realîzma Sosyalîst, têgînekî hunerî ya edebîyatê ye. Di destpêka sedsala 20an de pêşveçûna xwe bi hêz dike û li ser xîmê îdeolojiya Marksîzmê di edebiyata cîhanê de cihê xwe digire. Ji ber ku têkiliya wê rêbazê bi felsefeya Marksîzmê re heye ev rêbaz di hundirê xwe de taybetiyên polîtîk û îdeolojîk jî

dihewîne (Gürtürk, 2016: 3).

Realîzma Sosyalîst, di destpêka sala 1920an de ji nav tevgerên edebîyatê de tevgerê ji rêzê bû. Lê belê di sala 1930an û şûn de ev tevger bi alîkarîya dewleta Sovyetê ji tevgerên edebîyatê yê din vediqete, wan tevgeran bin pê dike, mezin dibe, teşeyê digire û dibe xwedan hêzeke serdest û navekî fermî li xwe dike. Salên Realîzma Sosyalîzm yê herî xurt salên 1930 û 1955 in. Realîzma Sosyalîzm piştî salên 1960an û pê ve êdî popilîteya xwe ji dest dide. Heta sala 1970yan ber bi lewazbûyîne ve diçe û piştî sala 1980an jî hêdî hêdî ji nav pelên edebîyatê emrê xwe tamam dike (Tangızade, 2006: 1).

Di bingeha feraseta Realîzma Sosyalîst de armanca rakirina proleter (çîna karker) heye. Ev feraset li ser rihekî şoreşker zûr dibe û birdozîya Sosyalîzmê îdealîze dike. Di navenda birdozîya Realîzma Sosyalîzmê de jî têngîna giringîya “mirov” pir muhîm e. Berjewendî hemû li derdora kesayetîya mirovan hewirdor dibin. Ev mirov xwe aîdê civaka xwe dibîne û xwe li hemberê vê civakê jî berpirsîyar dibîne. Birdozîya Realîzma Sosyaylîst her tim li ser dijayetî û nakokiyên civakî disekine, di vê têngîna edebî de “mirov”, di çarçoveya têkiliyên civakî de tê dîtin. Hewce ye ku nivîskarên vê zîhniyetê zêdetir li ser rastî û nakokiyên civakî rawestin û ji hemû nakokî û pirsgirêkên civakê re di nav sînorên nêrîna Sosyalîzmê de riyên çareseriyê bigerin û civakê ji hemû asteng û pirsgirêkan xilas bikin. Weke din nivîskarên realîst, di berhemên xwe da derbarê pirsgirêkên civakî de cih didin qewimandinên rasterast (Gürtürk, 2016: 3). Nivîskarê kurd yê ji vê ferasetê Erebe Şemo jî di romanên xwe de bi şayesandina lehengên xwe, xwe li hemberê civaka xwe berpirsîyar dibîne. Ew bi çavê çareserîyekî civakî li nivîsên xwe dinêre û dixwaze bi berhemên xwe re hişke nû ji bo civakê ava bike û bi rêya wan berhemên xwe gelek tiştan nîşanî gelê xwe bide. Em di berhemên wî da rastî dîroka neteweyî ya kurdan tên. Ew kevneşopîya gelê kurd bi helwesta Realîzma Sosyalîst û bi devokekî xweser vedihûne. Ew bi romana xwe ya yekem a bi navê “Şivanê Kurmanca” dest pê dike û heta romana xwe ya dawî anku “Hopo”yê wê rêçê dixemilîne. Di heman demê de ew xem û xeyalên civaka xwe dike malê mejîyê xwe û wan di nav rihekî realîste de radigîhîne. Romanên nivîskar dikarin wekî belgeyekî tarîxî jî bîn hesabandin. Lewra Erebe Şemo di çarçoveya xetên Realîzma Sosyalîzmê de ji xeynî jîyana

xwe, derbareyên şert û mercên wê heyami de agahîyên rasterast jî dide. Ji alîyê din ve mirov dibîne ku di merheleya nivîsandina van romanên de nivîskar ji folklorê kurdî jî gelek îstîfade kiriye û di heman demê de romanên xwe bi devoka Serhedê ve nivîsandine û zimanê axaftina rojane ya serdema xwe bi kar anîye. Ji ber vê yekê mirov di nav rûpelên van romanên de rastî gelek hêmanên axaftina heremî an jî lêvkirinekî xweser tê. Lê belê hêjayê gotinê ye ku Erebe Şemo di şayesandina lehengên romanên xwe her çiqas derbareyên şert û mercên civaka xwe da agahîyên rasterast bide jî bi zimanekî azad û kurdîyekî herikbar nikaribû romanên xwe bi peyvên kurdî bi xemilînê. Çinku ji alîyê Yekîtîya Sovyetê ve di yekemîn kongreya yekîtîya nivîskarên Sovyetê de çerçoveya lidarxistina berhemên û hêmanên bikaranîna zimanekî gelemper hatibû dîyarkirin. Divîya bû hemû nivîskarên Sovyetê li gorî vê çerçoveya hatîyî dîyarkirin berhemên xwe bi afirîndina.

Yekem kongreya yekîtîya nivîskarên Sovyetê di sala 1934an de hate li darxistin. Bi vê kongreyê re teorîya Realîzma Sosyalîst bû rêgezêkî bingehîn. Di heman kongreyê da Realîzma Sosyalîst wekî nêrîna fermî ya dewletê jî hat destnîşan kirin. Di kongreyê de li ser biryargirtina rêgezên Realîzma Sosyalîst nêrîna nivîskar û rêhevalê Stalin ê bi navê Jdanov pir girîng bû. Teorîya ji hêla Jdanov ve hatibû dîyarkirin di kongreyê de hat qebûl. Li gorî biryarên hatinî destnîşankirin, divîya bû nivîskarên Sovyetê berhemên xwe li ser vê teorîyê biafirandina. Li gorî wê teorîyê divê ku nivîskar hişê civatê ava bike, li hemberî dagirkerîyê serî rake û xelkî bi rêve bibe. Di kongreyê de biryarên hatinî girtin ji çend xalan pêk tê û yek ji van xalan jî lehengên erênî ne. Ew leheng hewce ne her tim bi awayekî şoreşger tev bigerin. Tevî ku zilm û zorê bibînin dîsa jî divê dest ji erka xwe bernedin û dawîyê jî ser bikevin. Li gorî teorîya Jdanov, lehengên sereke bila bi awayekî şoreşger bixebitin û ji bo hilberîna birdozîya Realîzma Sosyalîzmê peywîrên jîyana nû wegerin ser milê xwe. Li gel van gotinan edebîyata Sovyetê, hewceye pêşeroja Sovyetê bi lehengên erênî nîşan bide. Disa ev teorî dibêje bingeha Realîzma Sosyalîzmê li ser xîmê çîna karker ava bûye. Ji ber vê yekê jî lehengên romanên divê karker bin. Cotkarên di Kolxozan de dixebitin bin, gundî bin, endamên partîya sovyetê bin û xwendekarên komînîst bin. Jdanov, digot eger ev têgeh bicih werin dihê geşadana Realîzma Sosyalîst pêk were. Li gorî Jdanov

ev ne tiştêkî utopîk bû. Çinku wî digot pêşeroja Sovyetê ji niha ve tê avakirin. Nêrîna Jdanov di demeke kurt de li hemû Yekîtîya Sovyetê hate qebûl kirin. Nivîskarên li dîjî vê teorîyê dihatin an dihatin surgunkirin an berhemên wan li ser meseyan diman û nedihatî çap kirin an jî ew nivîskar bi hemdê xwe ji nav sînorên dewleta Sovyetê derdaketin (Göz, 2016: 5-6). Bi van gotinan re nivîskarên kurd ên sovyetê jî divîya bû li ser vê bingehe berhemên xwe biafirandina. Yek ji van nivîskaran jî Erebê Şemo bû. Taybetmendîyên romanên Erebê Şemo di nav mercên taybet ên civaka kurdên Êzdî û Yekîtîya Sovyetê de derdaketine holê. Romanên wî di bin xetên van mercan de teşe digirin. Di romanên nivîskar de gava rûdan dikevin berî damezirandina Bolşevîkan, ji folklorê kurdî îstîfade tê girtin û hêmanên axaftina rojane jî dikevin ser milê peyvên bi kurdî. Lê belê gava rûdan dikevin piştî damezirandina Bolşevîkan bêjeyên tîn bikaranîn dikevin ser milê peyvên Yekîtîya Sovyetê yê wekî heval, makîne, trêna, kolxoz, partî, sendîqa, zavod (kargeh an fabrîqe.) û hwd. Ev hêmanên axaftinê ji bo hemû nivîskarên Sovyetê mecbûrî bû. Hewce bû di hemû qadên hunere de xwe bidene xwiyakirin. Ji bo mekanên hunerê jî mekanên wekî gund, kolan, zavod (fabrîqa) kuçeyên meheleyan bî tercih kirin. Çinku bi Sosyâlîzmê re tenê jiyaneke nû nehatibû afirandin, bi çerçoveya jîyana nû re li ser çînekî proleter nasnameya zîmanekî çavdêrî jî hatibû ava kirin. Bi vê nêrîne re jixwe çerçoveya nivîsîna berhevan, ji bo Erebê Şemo ji hêla pergala Sosyâlîzmê ve hatibû avakirin. Anku şayesandina lehengan, cihê bûyeran, têgehên romanê û peyvên bî bikar anîn dîyar bûn. Li gorî van hêmanan tenê dagirtina bûyeran bi çerçoveya romana Sovyetê di deste nivîskar de mabû. Ji ber vê yekî bikaranîna peyvên bi vê çerçoveyê ve sînardar bû.

Taybetmendîyeke edebîyata kurdên Sovyetê ya din jî, zîncîrîya rûdanên berhevan in. Ev zîncîrîya berhevan, hem ji alîyê binyadî ve hem jî ji alîyê bîra etnîk a kurdên Êzdî û rêbaza Realîzma Sosyâlîst ve li ser çend fonksîyonan hatiye avakirin. Cara pêşî Vladimir Propp di xebata xwe ya Morfologiya Skazkiyê de (Teşenasîya Xeberojkan) hewla derxistina rêzîmana vegêrana edebîyata rûsî dike. Li gor Propp ev xeberojkên ku xwe dispêrin sih û yek fonksîyonên hevbeş ji alîyê binyada xwe ve li ser yek tîpî ne û rêzbendîya wan hertim wekî xwe ye. Ji bo edebîyata kurdî ya Sovyetê jî ji bo zîncîrîya rûdanan deh fonksîyon (beşên sereke

yên vegêranê) hatine destnîşan kirin. Ev fonksîyon di berheman de wekî zordarîya axa û began, zordarîya roma reş, rev, xêrxwazî û dostîniya ermeniyên, qenciya rûsan, rizgarkirina Şoreşa Bolşevîk, astengîya xerap ya adetên berê, bicihkirina bernameya damezirandina Sosyalîst, beşdarîya Şerê Wetanîyê (Şerê Cîhanê yê Yekem) û folklorhêzî tene rêzkirin. Ev fonksiyon hem xwedî taybetmendiyên binyadî ne hem jî ji îmajên etnik û îdeolojîk hatine dagirtin. Li gorî Boris Tomaşevsky ev rêgezên vegêranê ji bilî helbest û berhemên gernameyê di roman, çîrok û destanên helbestkî de bi rêya kronolojîk û têkilîya serdemkîyê bi hev re tîrêj kirin (Ergün, 2018: 3).

Di encamê de ev deh fonksiyon, çerçoveya sereke ya vegêrana edebîyata kurdî ya Sovyetê derdixe holê. Di hersê romanên Erebe Şemo yên ewilîn ên bi navê Şivanê Kurmanca, Berbang û Jîyana Bextewar da rûdan bi gelemperî pêşîya damezirandina Şoreşa Bolşevîk tîrêj kirin û rûdanên piştî Şoreşê jî diqedin. Mebesta vê ya sereke li vir berawirdkirina pêşî Şoreşê û piştî Şoreşê ye. Bûyer li ser xeta reş û spî hergav li hemberî hev tîrêj kirin. Rûdanên berî Şoreşa Bolşevîk li ser xeta reş in û neyînî ne. Hemû rûdanên zor û zehmet di vê merheleyê de derdikevin holê. Rûdanên piştî Şoreşê jî li ser xeta spî ne û erênî ne.

Di navbera rûdanên pêşî Şoreşê û piştî Şoreşê de zincîrîya fonksiyonên li jor hatine rêz kirin tîrêj kirin.

Di romanên de rûdan, pêşî bi zordariya axa û begên kurdan û zordestiya Roma Reş dest pê dikin û bi fonksiyona revê dewam dikin. Heta fonksiyona revê rûdan gelemperî neyînî ne. Bi fonksiyona revê re rûdanên neyînî dikevin asta herî jor. Di vê merheleyê de rûdan ji rêzê ve bi fonksiyona alîkarîya dostîniya ermen û rûsan dewam dikin û piştî damezirandina Şoreşa Bolşevîkan derdikeve holê û bi vê fonksiyonê re bûyerên neyînî diqedin. Carinan bi şayesandina lehengan re bûyerên berî Şoreşê ben vegotin jî di encamê de Şoreşa Bolşevîk her tiştî çareser dike. Di van hersê roman da hêmanên axaftinê, ji ber ku rûdanên wan gelemperî li ser rûdanên pêşîya Şoreşa Bolşevîk in xwe digihenîn tîrêj kirin etnik yê kurdî. Peyvên kurdî yê bilêvkirina nivîskar re, bi hejmara wan ya hatîyî bi destxistin, ji herdu romanên nivîskar yê bi dawîyê hatinî nivîsîn ve gelectir in. Di romana Hopo de rûdan carcaran bi devê lehengan biçin berîya Şoreşa Bolşevîk jî rûdan bi temamî di gundekî piştî damezirandina Şoreşa Bolşevîk de hatîne qewimandin.

Armanç bi nîşandayîna xebata xolxozê ya bi rêkûpêk e. Ji ber vê yekê piranîya peyvên hatinî bikaranîn, peyvên piştî Şoreşê yê jîyana nû ne. Hêmanên axaftina kurdî kêr in. Peyv bi gelemperî nîşaneyê jîyana nû a damezirandîna Realîzma Sosyalîst in. Jixwe bikaranîna van peyvên ji bo avakirina nasnameya damezirandîna Sosyalîzmê bivênevê bû. Ji ber vê yekê mebest li ser pergala nû ya Sosyalîzmê, rêvebirina karê kolektîfî yê kolxozê û li ser devoka temsîlkarên Sosyalîst ên kurd zûr bûye.



2. Ferhengoka Romanên Erebe Şmeo

Tablo 2. Peyvên di Romanên Erebe Şemo de Hatine Destnîşankirin

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
1.	Kesîb	Xîzan FZZ. r. 530	Şemo merivekî kesîb bû. ŞK r. 11
2.	Barbir	Dewara gir, dewara bari.	Şemo rêda gelle çetini dîtin, çimku barbirê wî tunne bû. ŞK r. 11
3.	Qef	Şikeft, eşkewt FCEB. r. 62	Rêda, gava tarî dikete erdê, xwe didane ber dîwara û qefa zinara. ŞK. r. 11
4.	Pak	Qenc, rind, delal, baş FZZ. r. 180	Pak tê bîra min ŞK. r. 12
5.	Merek	Aş, bo hêrana genim û cih FZZ. r. 21	Mereke tek li kêleka gund hebû. ŞK. r. 12
6.	Mecal	Mirin, FDUD. r. 107	Mecala min hat bîra min ŞK.r. 12
7.	Mîtal	Raman û fikirîna pir li ser tişteki. FCEB. r. 207	Ez ketime mîtala duşurmîş dibûm. ŞK.r. 12

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
8.	Pêpeling	Pêpelîsk, payîska ji daran hatî diristkirin pêpiken wê herdu jî darî ne. FKB. r. 517	Wextê wî linge xwe pêpelinga da avêt. ŞK. r. 12
9.	Teland	Dizika, ji yekê ra kemîn danîn. FDUD.r. 164	Min ji xwe ussa telandîye. ŞK.r. 13
10.	Lepitîn	Qulipîn, wergerandin. FKK.r. 560	Kurê min dewrêş hêzing da xwe, wekî wergêre ser kêlaka dinê, min hurdu deste wî girt, wekî qet nelepîte. ŞK.r. 13
11.	Gilî	Behs, gotin, tekes FZZ.r. 52	Min wan ra halê xwe û zara gilî kir. ŞK.r.13
12.	Kuta	Beskirin, bi dawî anîn, vebirîn. FKK. r. 84	Hetta dîya me şixulê xwe kutta kir. ŞK.r. 14
13.	Gom	Cihê kup ez tê da bi cih dikin, goma pez FCEB.r. 15	Zivistanê li gomê pez da û tewlada germ bû ŞK.r. 14

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
14.	Tewl	Cihê ku hespan tê da gire didin û bi cih dikin. FCEB.r. 277	Zivistanê li gomê pez da û tewlada germ bû ŞK.r. 14
15.	Hêsîr	Raxera ku ji gîya çêdikin û di bin hemû raxran da radixin. FCEB.r. 159	Wekî em hêsîrê hur badilhewa xwe tewlada germ kin. ŞK.r. 14
16.	Badilhewa	Bêhûde, bêtewş FCEB.r. 51	Wekî em hêsîrê hur badilhewa da germ kin. ŞK.r. 14
17.	Notl	Eynî wê, fena, mîna, weke FDUD.r. 118	Notla pepûkan, tî, birçî diman. ŞK.r. 14
18.	Hevan	Kavilê ku debaxkirî ku şivan nane xwe tê xinê. FCEB.r. 159	Diya min hevana nên, torbekî mira dirûbû. ŞK.r. 15
19.	Kaw	Wedîtî, dilgir. FCEB.r. 174	Ez zaf kaw dibûm û tire, Ez êdî bûm şivanekî tamim. ŞK.r. 15
20.	Fesl	Pîvan, qeys, rêbaz FDUD.r. 120	Bavê min jî nîşanê me dida fesla çerandinê. ŞK.r. 15

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
21.	Givrik	Mirovê hêzdar û xwurt FDUD.r. 143	Wextê em hizrekî givrik bûn. ŞK.r. 16
22.	Pesar	Erdeki ku ji çandinê re dest nade, çol. FDUD.r. 36	Her yekî ji me gerekê pesarîya çolê hişkirî bianiya. (bi maneya gihayê çolê yê hişkirî hatiye bikaranîn) ŞK.r. 16
23.	Çetîn	Zor, dijwar. FDUD.r. 71	Rastî jî bê barbir halê me çetîn bû. ŞK.r. 18
24.	Cew	Cû, cihok, cok. FCEB.r. 84	Cewêt avê. ŞK.r. 20
25.	Hijmekar	Çav tijî bûn , pesend. FCEB.r. 91	Mirov heyran hejmekar bû lê binêre. ŞK. r. 20

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
26.	Dugisîn	Kêlana ducarîya erde. FCEB.r. 124	Cot fikir bi kêlanê dugusîn. ŞK. r. 20
27.	Lod	Koma bilind, lota cehk, lota kayê. FCEB.r. 196	Gihê hezemetî çent seheta da top dikir dida ser hev, lod dikir. ŞK.r. 20
28.	Mehik	Bênivêj, jina di mehikê da. FCEB.r. 68	Mîna dewreşê me kurmanca wextê dikeve mehikê. ŞK.r. 21
29.	Saw	Sehw, tirsî ji ber wehmê. FCEB.r. 248	Sawa gura jî sawekî zafê çetîn e. ŞK.r. 25
30.	Menzil	Mesafeya kêşa çekê. FDUD.r. 242	Menzîla orta min û wan mabû çend gav. Şk.r. 29
31.	Daw	Pêş, quntar, bi cidîtî xwe amadeyî karekî kirin. FDUD.r. 83	Gur, guhê xwe pêl kirin û bû şeqa şeqa diranê wî, ewê min ra daw danî. ŞK.r. 29
32.	Xîr	Vala, xalî.	Rêxa dewar têkira sankê xîrekê bibira. ŞK.r. 34

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
33.	Lava	Daxwaza bi hêvî.	Qîzkê lava dê kir- çika dîya wê çi dibêje. ŞK.r. 41
34.	Şîro	Ravekirin, şîrovekiri.	Min yeko yeko wan ra şîro kir. ŞK.r.45
35.	Terane	Tinaze, qelf, henek.	Bavo, başî bi orta te çi terane vê gavê? ŞK.r. 49
36.	Kevî	Berav, kevîya avê.	Ez, Hossê û Ehmed kevîya çem, me dilîst. ŞK.r. 52
37.	Dolk	Avedank, dolken avê.	Li dolka da kurmanc dixebitin, berxa germ xweyî dîkin. ŞK.r. 54
38.	Enterî	Serkiras, eba.	Enterîyê rind. ŞK.r. 57
39.	Fîno	Kumê sor, fes. FCEB.r. 129	Fînoyê qotîkirî. ŞK.r. 57
40.	Virnî	Hillî, kavişkî, berx û karen ku berî demê de tene dinê. FCEB.r. 163	Holik ava kirine ji berxê virnî ra. ŞK.r. 58

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
41.	Pare	Nîv, tişteki bikî du pare, her parek nîve. FCEB.r. 215	Serşivana pare vekir her yekî me ra. ŞK. r. 58
42.	Şêwr	Pirsîna fikrên hev ji bo karekî. FCEB.r. 564	Şivan tev top dibûn, dihatine cem bavê min, şêwra xwe pê dixistin, pirs dikirin. ŞK.r. 59
43.	Gur	Perwerde bûn, hîn bûn. FDUD. r. 112	Teva gura bavê min dikirin. ŞK.r. 59
44.	Olam	Xizmet, paletîya xelkê, xulamî. FDUD.r. 276	Gelle merîyêd kesîb diçune olema bega, şuxulê wan dikirin. ŞK.r. 59
45.	Telle	Rastahîya k udi nav xilxileyê keviran de ye û li cihekî asê ye. Dafik, kemîn. FDUD.r. 403	Telle dadanîn weke kewrîşk saxê sax têkevinê. ŞK.r. 60
46.	Lorik	Penîrê lor. FCEB.r. 197	Lorik çêdikin. ŞK.r. 63
47.	Tûm	Her tiştê ku komek be, teyengîya ku di ber hev da radibin. FCEB.r. 284	Ber tûmê soyê yan tûmê kulîlkê çawa ew û dilketîyê xwe va cem hev rûniştine. ŞK.r. 65
48.	Paye	Rûmet, pile, mezin, gewre. FK.r. 495	Xort paye didane xwe çawa qewil-qirîyar dane hevdu. ŞK.r. 65

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
49.	Eyar	Derdenka çermîn a ku tiştan dikinê. FDUD.r. 113	Wana berxek serjêkir, postê wê kirine eyar. ŞK.r. 73
50.	Şewr	Şîret, amojkarî. FZZ.r. 15	Dîya min û bavê min şewr kirin, weke herime şehir. ŞK.r. 74
51.	Pol	Diravên kaxez, polên post e. FCEB.r. 221	Paîza sala 1914 de wextê hila ez ser zavodê dixebitîm, polkekî kaxez hat wê derê. ŞK.r. 77
52.	Tîmar	Lênêrîn, hesp paqijî. FDUD.r. 420	Hesp tîmar dikirin. ŞK.r. 77
53.	Dilbend	Werger, tercuman. FCEB.r. 121	Ez pak zanim zimanê Tirka, Ermenîya, Huruman û Rusan. Wana gote min were bibe dilbendê me. ŞK.r. 77
54.	Hêwirîn	Êwirîn, xwe avêtina cihekê an siha kesekê. FCEB.r. 137	Em rojê newala da dihewir in. ŞK.r. 79
55.	Qelf	Henek, tinaze. FDUD.r. 318	Teva kal bûn, qelf wan kala-eskera dikir. ŞK.r. 85

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
56.	Netê	Awerte. FCEB.r. 154	Weki gulle şixulê netê zabit û qozax tîne serê riatê. ŞK.r. 92
57.	Êgîn	Jêhatî, xwedan ferest. FDUD. r. 545	Xortekî zafî bedew û êgîn siyabendê slavîn. ŞK.r. 92
58.	Çewa	Bivêmevê, neçar. FCEB.r. 1654	Siyabend ne dihişt Xecê bigrî û sond dixwar - Çewa hebe, hergê kuştin be, bi zor be yan xweşî be destê ji xecê nebe. ŞK.r. 93
59.	Mîdas	Sol, pêlav FZZ.r. 565	Mîdasê lingê wan qetiya bû. ŞK.r. 106
60.	Zêrandin	Lêdan, nalandin, êşandin. FDUD.r. 470	Me diêşînin, dizêrînin. ŞK.r. 110
61.	Zûr	Kesê ku her li cihekî tenê dinêre. FDUD.r. 477	Hinek dihatin rex min ra derbas dibûn, zûr dibûn, li çavê min dinrîn. ŞK.r. 111

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
62.	Xinamî	Mirovatîya ji alîyê jinê ve. FCEB.r. 304	Dibên, kûrê Şemoyê xinamîyê te çere patşe (Padişah) kiriye. ŞK.r. 113
63.	Komek	Piştgiri.	Hetta ez sax bim, terka we nakim we bê komek jî nahêlim. ŞK.r. 117
64.	Çêr	Gaziņ, gazinde.	Guh nedin çêrên jinan. ŞK.r. 119
65.	Daw	Gelş, dawa, doz. FK.r. 145	Em bolşevîk daw dikin. ŞK.r. 120
66.	Peşmûrde	Perişan, şepirze. FDUD.r. 285	Tu paye wan rûtî, tena kiras derpêyanin. ŞK.r. 127
67.	Qunç	Qunc, quncik. CEB.r. 234	Qunçikê merekê giha tê de hebû. Ber.r. 6
68.	Tîrênc	Sîtavk.	Di kuleka merekê re tîrênc dabû binpiyê me. Ber.r. 6
69.	Qafe	Qatê serê mirov, qaf. CEB.r. 153	Bi qasî ejderhekî qafekî terikî lê. Ber.r. 6
70.	Hurpozî	Xwedan pozekî piçûk.	Mirovekî tijî, hurpozî bû. Ber.r. 7

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
71.	Terikî	Pir girs, pir fireh, pir giran. FDUD.r. 409	Bi qasî ejderha qafekî terikî lê. Ber.r. 7
72.	Bijoq	Bijok, belav. FDUD.r. 100	Simêlekî bijoqî qalîn lê. Ber.r. 7
73.	Zayî	Ziyan, xesar, zîrar. FDUD.r. 473	Gelekî gîha li ber pîyên me zayî bûbû. Ber.r. 7
74.	Telandî	Qelizîn, li benda fîrsetekî mayîn. FDUD.r. 316	Min wisa xwe telandîye, bîna xwe çikandiye, wekî qet bîn ji in neyê. Ber.r. 7
75.	Qûz	Ecêbman, heyîrîn. FDUD.r. 231	Wexta merik hat orta merikê, dîna xwe da dewsa lingên me qûz bû. Ber.r. 7
76.	Bal	Zêhn, dîqet, têkilî, baldarî. FDUD.r. 102	Mêrik ji nişkê ve sekinî, dîna xwe da dewsa lingên me. Ber.r. 7
77.	Qayîm	Şidandin, hişk kirin. FDUD.r. 175	Min bi herdu destan qayim girt. Ber.r. 7
78.	Pêpas	Binpêkirin, dewisandin. FDUD.r. 108	Mêrik lê nêrî ku gîha tev pêpas kirine. Ber.r. 7

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
79.	Ejdeha	Mar, zîya, marê mezin. FCEB.r. 128	Merivekî tijî, bejneki dirêj lê, bi qasî ejdehakê. Ber.r. 8
80.	Rojheq	Heqê bi rojane distînin, yevmiye.	Her roj dîya min diçû ji malan re bi rojheq dixebitî. Ber.r. 8
81.	Lap	Tam, pir. FDUD.r. 226	Wexta hewa lap germ bû, ez bi wan ra diçûm ber dewar. Ber.r. 9
82.	Kawîbûn	Kubar bûn, qure bûn. FDUD.r. 196	Ez zaf kaw bûm. Ber.r. 9
83.		Kepen, raxistina ku ji livayê tê çêkirin. FDUD.r. 219	Nivînên me kulavekî peritî û qulqulîkî bû. Ber.r. 11
84.	Pod	Kincekî stur a zivistanê ye û bi ser da tê li xwe kirin. FDUD.r. 309	Dîya me pot û palasê me diavêt ser tenûrê. Ber.r. 11

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
85.	Palas	Berika mûyê bizinan hatiyê çêkirin. FCEB. 279	Dîya me pot û palasê me diavêt ser tenûrê. Ber.r. 11
86.	Cem	Têyê barekê dewaran. FDUD.r. 57	Ji bo cemek genim an ceh me stuyê xwe li ber xelkê xwar dikir. Ber.r. 12
87.	Merkep	Maker.	Merkeba me avis derket, caşikek anî. Ber.r. 13
88.	Stêrk	Bi textan di nav malê de dirist dikin, xwarinê û tiştan li ser datînin. FKK.r. 630	Dîya min û bavê min pere dihejmarin dîsa dikirin qotîya hesin da dikan û dikirin têrê da dida goşeya stêr. Ber.r. 13
89.	Binalî	Binecî, hevvelatîyê resen. FCEB.r. 72	Ji wê gundî re merivên binalî digotin Komesor. Ber.r. 13
90.	Guhdirêj	Ker, ceş. FDUD.r. 147	Wexta me guhdirêjê xwe stant, payîs hat. Ber.r. 13

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
91.	Şêlim	Cure giyeyekê xwarinê ye, ser û belgen wê tê xwarin. FKK.r. 651	Di wan bostanan da kartol, nok, kelem, şêlim diçerandin. Ber.r. 14
92.	Dugûsin	Kêlana ducarîya erdê.	Ûris ekincînê pir rind in. Bi kotanan dugusîn, sêgusîn gîha didurtin.
93.	Sêgusîn	Kêlana sêcarîya erdê. FCEB.r. 124	Ûris ekincînê pir rind in. Bi kotanan dugusîn, sêgusîn gîha didurtin. Ber.r. 14
94.	Parxan	Qolinç, hestiyê pişte. FCEB.r. 233	Wan meleganên xwedênas parxan û desten gavanan dişikêandin. Ber.r. 15
95.	Ayîk	Heq, ayn. FDUD.r. 16	Xwedê ayîkê min belengazî ji we re nehêle. Ber.r. 15
96.	Pêçke	Çerxe, taye, toterîk. FDUD.r. 295	Ermeniyê Kaxdekan avêt pêçkê saxe sax şewitand. Ber.r. 16
97.	Naxir	Garan, kerîyê dewar. FCEB.r. 211	Ew naxirêd dewar me tene nikarîbû biçeranda. Ber.r. 16
98.	Çarneçarî	Bêçare, mecburî.	Ew dizîya kartolan me neçarî dikir. Ber.r. 19

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
99.	Qoncik	Xwe kişandina hev. FDUD.r. 250	Ji sermaye payîzê min xwe dikir qoncik. Ber.r. 19
100.	Mirdar	Heram, qirêj, kirêt. FDUD.r. 250	Jinêd Melegana qe nedihîştin linnê me bi ser şêmika wan kete, digotin hûn mirdar in. Ber.r. 19
101.	Şêrmik	Cil, xaliçe. FDUD.r. 59	Jinêd Melegana qe nedihîştin linnê me bi ser şêmika wan kete. Ber.r. 19
102.	Delk/ delkî	Tiranekar, har. CEB.r. 107	Gurên payîzan delk in. Ber.r. 20
103.	Risas	Cureyekî madenan e.	Ez li ber agir risas bûm. Ber.r. 21
104.	Xûz	Nizimkirin, xwe nizim erdê kirin. FDUD.r. 458	Ez xûzî erde bûm. Ber.r. 22
105.	Îcar	Vê carê, vê teqlê. FDUD.r. 180	Hucûma min a îcarin baş bû. Ber.r. 22
106.	Çilape	Çaryek, çargavî, xera sewalên çarpê ya hera lezgîn. FDUD.r. 65	Qewreş (se) di ser kaviran re çilape kir û hat. Ber.r. 23

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
107.	Qudum	Qewet, taqet, hêz. FDUD.r.	Di birçîbûnê qudum di çonkên min de tune bû. Ber.r. 23
108.	Berate	Elamet, nîşane, şop. FDUD.r. 108	Wexta gur pêz duxwe, her lazime berata wan bînin bidin xwedanê wan. Ber.r. 24
109.	Qaim	Bingehîn, esasî. FDUD.r. 45	Min xwe hebekî blind kir, wekî, qalim di guhê wî de carekê din jî bibêjim. Ber.r. 24
110.	Teher	Şekl, şêwe, bi vî avayî. FDUD.r. 388	Bi vî teherî ez ji destê wan herdu Meleganan xelas bûm. Ber.r. 27
111.	Kurşe	Berfa ku baran ser de bibare paşê wek kevir hişk dibe.	Meriv karibe di ser kurşê re biçuya bajarê Qersê. Ber.r. 29
112.	Kod	Pîvek. FDUD.r. 307	Tu du kod arê xas têkî mêşokekî. Ber.r. 29
113.	Xas	Tiştê ku ji derve de tişteke tev nebûye. FDUDj.r. 445	Tu du kod arê xas têkî mêşokekî. Ber.r. 29
114.	Pung	Koxikê mirîşk, qaz û hwk.	Min hêk ji pungalêd mirîşkan top dikirin. Ber.r. 29

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
115.	Wekilîn	Dubarekirin, êrekinin.	Matvêy, axayê min disa wekiland. Ber.r. 30
116.	Mikur	Nas, eşkerakina xwe. FDUD.r. 249	Wekî tu xwe ne mikurî ez ê serê te lê xim. Ber.r. 31
117.	Temûl	Qerar, biryar. FDUD.r. 48	Dile min temûl neda, min jî xwast biçim rênçberîya xwe. Ber.r. 33
118.	Testîq	Ereyî, erene kirin. FCEB.r. 129	Bavê min jî ew gilî testîq kir. Got: bila here. Ber.r. 34
119.	Berbirî	Bervehatin.	Gava ku ez dîtîm mamoste û qîza xwe birbirî min ve hatin. Ber.r. 39
120.	Razîlix	Spasdarî, desturdan, rêdan.	Wê razîlix da min û got tu kurekî aqil î. Ber.r. 39
121.	Boçk	Qol, devkinik. FDUD.r. 324	Av bianiya têkira boçkê ji bo vexwarina şagirtan. Ber.r. 41
122.	Otax	Menzîl, ode.	Otaxên dersxaneyê gêsî bikira. Ber.r. 41
123.	Qol	Îmzekirin. FDUD.r. 184	Min qolê xwe nizanîbû bikişanda, şagirtekî dewsa min qol kir. Ber.r. 42

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
124.	Qemitîn	Zeliqîn, mûsikîn. CEB.r. 228	Herf li ser kaxazên qalind qemitandî bûn. Ber.r. 43
125.	Qinyat	Qêm, qeneet. CEB.r. 232	Ji min re bû qinyat, êdî ez xwandina xwe serfînyas, bi dil û eşq hîn dibim. Ber.r. 43
126.	Mêtrîk	Nasname.	Kaxaza ku tê de rojbûna meriv diniwîse. Ber.r. 48
127.	Çerge	Tebeq, qat.	Xaniyê wan hatibûn avakirin du çerge. Ber.r. 48
128.	Eyan	Kifş, eşkere. FDUD.r. 112	Emre mine eyan bû. Ber.r. 48
129.	Sivder	Hewana malê Derazinka dere malê. FDUD.r. 368	Cîyê min timî li tewleyê bû lê cîyê min anîbûn sivderê. Ber.r. 51
130.	Peleseng	Erzan, kêmbiha.	Hemû tişt li wê dere peleseng e, bol e. Ber.r. 51
131.	Berdîr	Miha du û sê salî. FZZ.r. 74	Serjê kiribûn du berdîr. Ber.r. 53

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
132.	Beroj	Qazan, qoşxan. FZZ.r. 98	Beroşêd mezin li ser kurmê êgir. Ber.r. 52
133.	Qeyd	Qes, pîvan, fesal. FDUD.r. 120	Simaweran bikelîne, qeyda me tu dizanî. Ber.r. 53
134.	Arxayîn	Piştirast.	Xanima malê: Ereba wekî tu zû semaweran bikelînî ez ê du çayan bideme te. Ereb: tu pereyan jî nedî ez ê çayê biqedînim tu arxayîn b e. Ber.r. 53
135.	Fêz	Jor, bilind.	Di fêza gişkan de runiştibû keşîşê wan. Ber.r. 53
136.	Firxûne	Ereba hespan, ereba payton. FCEB.r. 142	Xweyîyê malê, Ereb: sibeyê zû rabe hespan gire bide, firxûnê hazir bike ez ê bibim Qersê. Ber.r. 53
137.	Arîk	Ji hindûr ve banê xanî. FDUD.r. 11	Dumeqeskan di ber arîkên xaniyêd bilind de bi nikulên xwe herî dianîn hêlîn çêdikirin. Ber.r. 56
138.	Dolge	Dolgeh, koz yan çereya nihale.	Wexta êdî serê pêz têketayê, bizaya Kurdan karê xwe û dolgeyan dikir. Ber.r. 65

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
139.	Col	Kerê têkilê pez û bizinan. FCEB.r. 86	Berî gişkan beg, axeler û dewletî diçun cîyê rind digirtin. Paşê col diçûn cîyê dolgeyên xwe kifş dikirin. Ber.r. 65
140.	Kolos	Kumê kulavîn e gewr û dirêj. FCEB.r. 186	Kolosêd serê wan tijî şar û şimaqî bûn. Ber.r. 68
141.	Kulîn	Jûra erzaq û nivînên malê. FDUD.r. 220	Di konên wan de hebû cîyê mêvanan, kulîn û cîyê nav malê. Ber.r. 69
142.	Cerd	Eriş, talan û desteserî. FDUD.r. 58	Rojekî cerdê avêt ser pezê wî. Ber.r. 72
143.	Gujme	Erd, nihâl, dol. FZZ.r. 414	Beko da bilura xwe, çû serê gujmekî sekinî. Ber.r. 72
144.	Obe	Çihê ku eşîr konê xwe lê datîne. FZZ.r. 672	Avêtine ser pezê obeyekî. Ber.r. 75
145.	Ese	Eseh, piştrast, tamam, bê guman. FDUD.r. 129	Ev yek cahil dikin û ese ye. Ber.r. 81
146.	Tewq	Bendînema, tewqîf. FZZ.r. 77	Birayê min Biro, bu kevirê binê bîran, me tewqa xwe jê birî. Ber.r. 83

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
147.	Keşkul	Fraqa ku derwêş xwarina xwe tê da dicivirînin. FCEB.r. 180	kose, keşkule di dest da ne cirebcê top dikin. Ber.r. 81
148.	Koçek	Zanayê Êzidîyan. FDUD.r. 215	Beko, ji Ereb re got: tu yê herî li binpiyê odeyê bisekinî slavê bideyi, bibêjî bavê Koçek. Ber.r. 84
149.	Temene	Aşandin, silav. FCEB.r. 45	Bavê min li ber wî temene dibe, yeko yeko ji axê re dibêje. Ber.r. 85
150.	Selef	Riba, pereyê deyn bide yekê paşê bi awayekî zêde ji wî kesî bistîne. FWK.r. 786	Bavê minî belengaz ew pereyên bi selef standî bû, xerc kiri bû. Ber.r. 85
151.	Şoş	Cihên pîr nizim. FCEB.r. 267	Heta em ji Qaxizmanê derbas bûn, em di şoşeyê de çûn. Ber.r. 93
152.	Qefilandin	Rawestandin, zeptkirin. FDUD.r. 200	Ez hela hê cahil bûm, min pak hesp nediqefiland. Ber.r. 935
153.	Xelifandin	Şaşwazkirin, xurufandin. FDUD.r. 438	Ew rêya ku em têda diçûn, min şaş kir, xalifim. Ber.r. 95
154.	Wehîd	Tenha, cihê ku kes tê de nebe.	Li wî çîyayî ez mam tênê, çîyayê nenas û wehîd. Ber.r. 96

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
155.	Cinyaz	Cenaze.	Ez qet ne tirsîyam ji cinyaz. Ber.r. 98
156.	Deboxane	Embara çekî. FCEB.r. 106	Hindurê tivingê dibiriqî, te digot taze ji deboxaneyê anîne. Ber.r. 98
157.	Çomax	Şiva serpopil. FCEB.r. 77	Gava çomaxê wî diket dest, kesekî pê nizanîbû. Ber.r. 202
158.	Mertal	Parêzkar, muhafezekar. FCEB.r. 281	Gava mertala wî diket dest, kesekî pê nizanîbû. Ber.r. 202
159.	Zexîre	Debar, zewzde. FDUD.r. 468	Ji ûrisetê esker dihat li wê dere rehet dibû, zexere distand. Ber.r. 202
160.	Ced	wekîl, cihgir.	Kî cedê te ye, wekî te pêş wî ve qelen daye min. Ber.r. 106
161.	Rikêf	Êrîş, cerde, nijde. FCEB.r. 83	Sefo, ji cî rikêfê min kir. Ber.r. 106
162.	Dizgîn	Serê game ê bi destan tê girtin, gem. FDUD.r. 100	Dizgîna mahînê ji deste min derxist. Ber.r. 106
163.	Sûd	Bersîvdana rapirsînekê derbirin, îfade.	Çend rojan bi şûn da bi hikumê kumandat bû sûda min. Ber.r. 107

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
164.	Bêgar	Kesê ku bêpere û bê hember dixebite. FDUD.r. 37	Romê zilmeke wisa bû, olam bêgar, serê pez, serê dewar xerc ji wan distandin. Ber.r. 109
165.	Erhede	Dibe ku, îhtimalek heye ku wisa be, çê dibe.	Wexta beran berdan pez, wekî ku berê ewilîn miya qerqaş hat beran, demek wê zivistanê erhede berf bikeve. Ber.r. 110
166.	Rim	Cureyekî lomê ya cengê yê berê ye, mizrak. FDUD.r. 343	Mêrên bi sîlih, şûr û meral û rim. Ber.r. 110
167.	Qeme	Qame, Sator yan kêrikek, bi serê tivengan ve ji bo karen leşkeri,	Li hemberî şerê romê, mêrên bi sîlih, şûr û meral û rim, piştî û qeme hazir bin. Ber.r. 110
168.	Beled	Serwext, încekirî. FDUD.r. 184	Beledê me serkisê Ermenî bû. Ber.r. 110
169.	Koç	Lijne, deste, qebîle.	Li cîyayê toprakqelê eskerê romê xwe gihand koça me, ji alîyê din ve jî jinan, cahîlan û meran jî bê sîleh koçên romê diajotin. Ber.r. 111
170.	Bêmûr	Xwîngerm. FDUD.r. 256	Miletê Êris miletekî zaf rinde bêmûr e. Ber.r. 111

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
171.	Qûl	Kole, dîl. FZ.r. 78	Ya Romê dianîs serê me qûl jî ne di wî halî de bû. Ber.r. 112
172.	Salix	Agahdarî. FDUD.r. 7	Li wê dere j imin re salix dan. Ber.r. 112
173.	Kîfer	Hedef, meqsed. FDUD.r. 116	Heyran xwe nekin kîfera güleya min. Ber.r. 116
174.	Dêzêrtîr	Ew eskerê ji şer direvîya, xwe vedîşart, nediçû şer ew êdî dibû dîzertir. EŞŞK.r. 117	Gelek esker ji şer direvîyan dibûn dêzêrtîr. Ber.r. 117
175.	Saskar	Serederî, pêkanîn û qedandin. FDUD.r. 356	Ne ez î kal im, êdî li çolê li ber dwêr ancax saskar dibim. Ber.r. 119
176.	Zimêr	Dexl û derhat. FZZ.r. 1077	Zimêrê me yî zivistanê tune bû. Ber.r. 122
177.	Nanoziko	Xebata ku tenê kerî ziktêrîyê tê. FDUD.r. 258	Wekî merivên mînanî min pale, mînanî te şivan bê heq, nanoziko dixebitin. Ber.r. 124

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
178.	Hewirze	Xirecir, pevçûn. FDUD.r. 453	Hezar pale wekî rojheqê wan zêde bikin hewirze dikin. Ber.r. 225
179.	Qemer	Esmer.	Xortekî qemer. Ber.r. 127
180.	Qefl	Ref, kerî. FDUD.r.315	Ji gundan bi qeflan merivên teze dianîn ser wê rêya maşînê. Ber.r. 128
181.	Kamêr	Odeyên piçûk ên qelean.	Di qeleyê da ku kamereka tekane yî piçûk da hişê minhat serê min. Ber.r. 132
182.	Edlayî	Edalet, dad.	Em dixwazin edlayîyê. Ber.r. 132
183.	Îyûn	Meha îlonê.	Ez heta meha îyonê mam. Ber.r. 132
184.	Beşer	Feraset, fehm û zanîn. FZZ.r. 105	Morof, guh dida van gilîyên min , beşara wî xweş dibû. Ber.r. 135
185.	Eks	Îmadî, bédilî. FCEB.r. 132	Beg, bi eks got, mêvanên ezîz hatin. Ber.r. 143
186.	Kese	Raste rê, rasterast.	Ez kese çûm Dîgorê. Ber.r. 144

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
187.	Hembal	Bi barê pişte tişt hilgirtin, hemal.	Ji te re hembal ne lazi me. Ber.r. 151
188.	Hingor	Maweya zemanî ya ji tarîbûnê hetanî dema razanê. FDUD.r. 175	Me di xewa hingorê de lêxist. Ber.r. 153
189.	Qereberban g	Bere sipêdê, elînde. FK.r. 620	Paşê bi qerebebanga sibêyê re am çûn. Ber.r. 153
190.	Sitq	Qêm, niqyat, nîyet.	Ew xwastina min î bi sitqê xwe yî sax, wekî ez zû silamet bibim. Ber.r. 155
191.	Bethal	Bê hal, bê teqet.	Wisa bethal bûm, min nikariya bê dar bigeriyama. Ber.r. 155
192.	Kulzikî	Bi kutekî, bi hikmê zorê.	Qazaxan bi kulzikî ez hiştim, ji min bi dûr ketin. Ber.r. 156
193.	Cihet	Lehz, gav.	Vê cihete ji van deran derkevin, ez hukum dikim. Ber.r. 156
194.	Îlamkirin	Bawerkirin.	Îlam bikî, wexta min güle agir dikir, guleya min tu carî li erdê nediket. Ber.r. 159

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
195.	Hewşan	Cureyekî çereyê ye. FZZ.r. 457	Ciyînan dêm bû, lê ciyînan dibû şoreket, hewşan. Ber.r. 160
196.	Daraxac	Dara darpêvekirinê, sêdar.	Di gundê me da meriv güle dikirin, gelek meriv daraxacê ve kiribûn. Ber.r. 162
197.	Ceribandin	Di çadekî zanînê de ceribandina têgehiştina kesekî. FZ.r. 483	Hevalînê cerebandine. Ber.r. 163
198.	Hêsa	Hêsan, bê zehmet.	Em ji golê derketin ser rêya hişk, em êdî hêsa rê diçûn. Ber.r. 164
199.	Jon	Qirêj, şêlav.	Jinên partîzan kincên me dişîştin, wekî em bir ê ve dijonnebin. Ber.r. 164
200.	Çelqûm	Xîzê gir, berhûr.	Ew rêya em têda dihatin rêyeke çetîn bû, çelqûm bû. Ber.r. 165
201.	Zelûlî	Dilşikestî. FCEB.r. 314	Ji wan zelûlîya ku wan dikişand. Ber.r. 166
202.	Hîz	Kevilê pezê debaxkirî ji bo dew, ji bo avê. FZZ.r. 612	Deve hîz dirêjî min kir, min pênc deqeyan av vexwar. Ber.r. 166

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
203.	Zarî	Qîrîn, jarîn.	Wexta ku ez zarî bûm û min lava kir. Ber.r. 166
204.	Qelibîn	Li hev hatin, li hev ketin. FZZ.r. 584	Ji nişkê ve li naxirekî dewaran em qelibîn. Ber.r. 166
205.	Tevlû	Tevlûhev.	Bi zimanekî tevlû Ûrisî got. Ber.r. 167
206.	Bîn	Bêhn, westa xwe danîn. FZZ.r. 66	Me ku av têr vexwar, bîn hat ber me. Ber.r. 167
207.	Egle	Derengî. FZZ.r. 326	Min hinekî xwe egle kir. Ber.r. 168
208.	Kêzîn	Borî, lule. FDUD.r. 210	Ava golê di qûmê de kêzîn dikir. Ber.r. 168
209.	Hemûk	Hemî, tevî.	Hemûşk kifş bûn. Ber.r. 170
210.	Beşerxweş	Rûgeş, rûxweş, devkenî.	Rengekî beşerxweş lê bû. Ber.r. 172
211.	Xilmet	Kevin, tişteki ne nû ye bere jî hatiye bikarnîn. FDUD.r. 452	Pêncekekî xilmet î eskeriyê lê bû. Ber.r. 172

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
212.	Mexluqat	Netewe, gel, millet. FCEB.r. 2005	Me got, wekî mexluqet qet ji dîwana we heznaket. Ber.r. 173
213.	Dîndar	Bejn û bal, dîtina kesekî a bi bejn û balî.	Dîtina hevalê Kîrov. Ber.r. 174
214.	Warge	Cihê mirov bişê xwe lê bigire. FZZ.r. 514	Qe tu warge an kendalek rastî me nehat em lê bimînin. Ber.r. 178
215.	Sepe	Muqayet, dîqet, hişyarî.	Em gereke xwe sepe bikin li vir. Ber.r. 180
216.	Hogeç	Beranê çarsalî. FZZ.r. 474	Kerîyê han hogeç in. Ber.r. 181
217.	Xerîd	Bikir, muşterî. FZZ.r. 1026	Ev kerîyê han gereke îsal xerîd bifirota. Ber.r. 181
218.	Zengû	Rikêla ku siwar linge xwe têxê û siwar dibe. FCEB.r. 315	Zengûyê hespan. Ber.r. 189
219.	Gumreh	Guhana dawiya xêr û xweşîyê. FCEB.r. 153	Bi saya Partîya Komûnîst di nava Kurmancan da dest bi xebateke gumreh bû. Ber.r. 189

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranîne
220.	Himangê	Piçekî, lehzekê.	Pîr Ebas himangî xeber dida. Ber.r. 195
221.	Xalifîn	Şaşwaz bûn, xurufîn. FDUD.r. 438	Vê şeve tu xalifî, çi li te qewimîye. Ber.r. 195
222.	Tîma	Temah.	Xweyîyê wê dewletê te digot ka kesîbeke. Ber.r. 196
223.	Hacet	Hecet, leç, hincet, Sebebên bê bingeh. FWK.r. 98	Hemû hacetên Emerîk beyî gişkan hazir bûn. JB.r. 19
224.	Hedad	Asinger, kesê aşinan dike amûr. FWK.r. 61	Kotan û cot hazir dikirin ên ku şikestin, dibirin cem hedadan didan çêkirin. JB.r. 19
225.	Sênç	Şek, şikestin, sêne û moral xirab bûn. FWK.r. 117	Ev caba nexêr sênca Emerîk şikand. JB.r.21
226.	Kizîr	Mezinê gund, keya, kexuda. FK.r. 392	Ev çend sal in ez kizîrê vî gundî me. JB.r. 21

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
227.	Bertîl	Rîşwet, kamçûr. FZZ.r. 102	Romê ji Kurmancan distand bertil. JB.r. 22
228.	Misîlet Kirin	Guftugo kirin, niqaş kirin.	Ew rûnştin li odeyê û misîlet kirin. JB.r.37
229.	Raçav	Çavdêr, çavder. FWK.r. 1661	Te digot tebîyetê ew mal raçav kiribû. JB.r.50
230.	Qemçûr	Dayîna ku dewlet ji bo pêz her sal distînê. FWK.r. 228	Xercên zilimkarên Romê dîş kiresî, Qemçûr bûn. JB.r. 50
231.	Seqirîn	Rehet bûn, hêsa bûn, sahil bûn. FWK.r. 169	Hema kut arî ket erdê gund seqirî, ket xewê. JB.r. 53
232.	Kotel	Tabût, textê pê cenaze radikin. FDÎ.r. 347	Wekî merivek dîmir, gundî, tev top dibûn, şîn dikirin, kotel girê didan. JB.r. 58
233.	Xulgşirîn	Xwînşerîn, rûgerm.	Bûk yekî reşî bû lê xulgşirîn bû. JB.r. 73

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
234.	Havijî	Hesûdî, çav nebarî kirin. FWK.r. 508	Ez havijîyê dibin wan, bextê mêrikan hebûn, xwişkên wan hebûn bê qelen zewicîn. JB.r. 85
235.	Sîle	Lêxistina bi kêfa destî, şeqem. FDUD.r. 369	Sîleyekî qayîm bi îsmail xist. JB.r. 93
236.	Qewîn	Sext, zexm, şidiyayî. Fdud.r. 32	Ew giliyêd Lenîn qewîm di sereê merivan de rûnişt. JB.r. 105
237.	Selexane	Teral, pê giran. FCEB.r. 295	Cîyê xwe ranebû paşû xwedîyê got jinêd selexane wisa ne. JB.r. 134
238.	Qelaçe	Dîwarê parastinê, kozik. FCEB.r. 345	Ew tirsîya, ji qeleçeya xwe rabû bireve lê guleyek li enîya wî ket. JB.r. 137
239.	Dilxorî	Stû şikestî, mûr ketî.	Rojekî Ermniyan cab anîn wekî sê roj in li ser bajarê Sariqamişê şer e, mexlûqet dilxorî bû. JB.r. 147
240.	Aran	Deşt, rastî, best. FZZ.r. 176	Cîyê wî gundî aran bû, zivistana wî gundî qet tune bû. JB.r. 150

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
241.	Merûm	Bêpar, jê mayîn.	Îsal çend sal in ji ber şer xelq ji alîyê kincan ve merûm e. JB.r. 169
242.	Piçikîn	Li hev rast hatin.	Ez û hirç em li hev du piçikîn. JB.r. 227
243.	Kêlandî	Dasekî devê wê wek heyvê ye ji bo gîya dirûnê. FK.r. 638	Wexta bi kelendîyan giha û nan didirûtîn. JB.r. 242
244.	Xunav	Şevnem, çîpên ava baranê. FWK.r. 1872	Qet baran jî tune bû lê xunava şilayîyê dihat kifşê. JB.r. 268
245.	Afetî	Hêz, Xwirtî	Kurdan bi afetî û mêrxasî şer dikir. Dim.r. 11
246.	Timî	Hertim.	Bahar tîmî dereng dihat. Dim.r. 17
247.	Axpîn	Nûpîvekî zevîye. FCEB.r. 48	Êdî axpînên xwe yên li dora malan nan diçandin. Dim.r. 17
248.	Oxîr	Yom, qudûş. FDUD.r. 278	Oxirmayên giran derbas kiriye. Dim.r. 19

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
249.	Qasid	Qazid.	Qasidê xwe şand cem Mirad Beg. Dim.r. 19
250.	Cirm	Ji tewanbariyê para ku dikeve para mirov. FDUD.r. 60	Li ciyê belasebeb me cirm dike. Dim.r. 21
251.	Qasik	Fraqên ku xwarin tê de tê pijandin. FDUD.r. 313	Hebûn hostexane çêdikirin qasik. Dim.r. 21
252.	Zirî	Zirhî, ew bervankên ji hesinî dihatin çêkirin ku di şerde ji bo parastina laşe mirov.	Hebûn hostexane çêdikirin mertalê zirî. Dim.r. 21
253.	Gem	Celew, a serê sewalên swarbûnê. FDUD.r. 57	Zeng û gemên hespan. Dim.r. 21
254.	Bîter	Peyda.	Çi dibêjî tê de bîter dibû. Dim.r.22
255.	Xerît	Xerç kirin, ji deste xwe derxistin.	Ji welatên dûr bazirgan dihatin eşyayên xwe xerît dikin û diçûn. Dim.r. 22
256.	Hewes	Xwestî, heweskar, mereqdar. FDUD.r. 99	Ji bo hespên kurdan ên kihêl ji hemû welatan tîn, bi hewes dikin û dibin. Dim.r. 23

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
257.	Rişte	Hevîr, birûn distrên û destan zirav badidin û dibe rişte. FCEB.r. 243	Di kelehê de gelek xwarinxane hebûn rişte çêdikirin. Dim.r. 24
258.	Şile	Xwarineke ji savar û nîskan çêdibe. FCEB.r. 266	Di kelehê de gelek xwarinxane hebûn rişte çêdikirin. Dim.r. 24
259.	Tomarî	Peymana bi komasî, tifaqa bi komasî. FDUD.r. 293	Wan mal bi tomarî dikîn û bi tomarî difirotin. Dimr.r. 24
260.	Dilêk	Lavelav, bi dilekî satî di ber xwedê gerîn. FCEB.r. 193	Ën ku bi dilekî dikirin, ji xwe re nan berhev dikirin. Dim.r. 25
261.	Elawet	Rezil, reşkenî. FDUD.r. 145	Rûyê xwe hene kiribû, ew kiribû elawet. Dim.r. 37
262.	Fizirîn	Xwe egle kirin, fisfisandin. FDUD.r. 302	Xwe difizirîne. Dim.r 39
263.	Serwêr	Îqtidar, hukumdar, hêzdar. FDUD.r. 92	Wekî ku ew xort serwêran e, dibe ku kurê begekê be. Dim.r. 40
264.	Şêmik	Navder, şîpane, derazink. FCEB.r. 109	Tu gerek vê nivîştê biwi, li şêmika mala bavê wê çahl bikî. Dim.r. 44

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
265.	Haf	Cih, meydan, himber. FK.r. 548	Li hafa Xano bimbarekîya eydê dikirin. Dim.r. 44
266.	Hevdan	Dan û standin, giftogo. FCEB.r. 104	Bimbarakîya eydê dikirin û hevdayî didan. Dim.r. 45
267.	Mixanetî	Xayînetî.	Wekî tu hatiyî ji bo mixanetîyê tu xêrê nabînî. Dim.r. 47
268.	Tajî	Cureyekî heywanêt nêçîrê ye. FDUD.r. 398	Bê tajî nikare pak nêçîrê bike. Dim.r. 50
269.	Fêris	Hêja, egit. FDUD.r.121	Ên ku bi Xano re di gelek şeran de mêranî kiribûn û fêris derketibûn. Dim.r. 51
270.	Kîp	Qayîm, şidiyayî. FDUD.r. 215	Esker gî kîp sekini. Dim.r. 52
271.	Terxan	Awîte, awîteyî. FCEB.r. 48	Cimku ew hesp têrxan in, hînê merivan nebûne. Dim.r. 54
272.	Fîq	Dûdik, pîpik. FWK.r. 722	Duduyan li fîqê dixist. Dimr.r.60

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
273.	Xewle	Tenê, xef. FDUD.r. 450	Qorşût hebekî xewle kir û gotê. Dim.r. 63
274.	Dilqe	Qilix, diyarbûn. FCEB.r. 118	Heta niha me gelek merivên mîna we eyan kirine, hem bi dilqê mertivan hem bi dilqê derwêşan. Dim.r.68
275.	Risqet	Destûr, rêdan. FK.r. 194	Silêman Xan heke tu risqetê bidî, ezê herim. Dim.r. 81
276.	Şepe	Aşût, herifîna berfê.	Şepa ji jorde hat, ew swar g idi berfê da hatin nixamtin. Dim.r. 83
277.	Xîç	Tîr, hêl. FK.r. 695	Ew berxê ku di wextê da têr şîrê xîç dimêje, zû qewet dibe. Dim.r. 89
278.	Mehde	Hêza xwarinê, îştah. FDUD.r. 43	Şivanan bi mehdeyê taştê xwarin. Dim.r. 91
279.	Teribîn	Asayî. FK.r. 41	Nizam tu çima bextê xwe diteribînî. Dim.r. 94
280.	Kelb	Se, kûçik.	Gava ku ew nêzîk bûn bû ewtênîya kelban. Dim.r. 97

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
281.	Destek	Berxa ku şivan an kurê malê ji xwe re dîyar dike. EBPD.r. 161	Serşivan desteka xwe girt anî cem Şebab. Dim.r. 98
282.	Yextirme	Hespê ku swarê wî dikujî û distînî. FCEB.r. 312	Gava ku me zar dida dijminan, yextirme jî ji dijmin distant. Dim.r. 107
283.	Qelaç	Çeper, sîper. FDUD.r. 219	Ji qelaça şer Qadî Beg. Dim.r. 112
284.	Kese	Ji bo çûyîna çihêkî rêya herî nêz.	Wekî em di rêya kese re herin, em dê zû bigehin kela Dimdimê. Dim.r. 116
285.	Sût	Rengê şîn ê ku dişibê renga kesk, keskber. FDUD.r. 374	Çavên wî yên sût. Dim.r. 119
286.	Amitam	Gehejtî, tam mêrî.	Ez êdî merivekî amîtam bûm. Dim.r. 122
287.	Keftar	Cureyekî sewalên çolê ye û dişibe guran. FDUD.r. 189	Ev serê keftaran e. Dim.r. 128
288.	Şaşmetal	Şaşbûn, şaşmayîn.	Mirovên meclîsê şaşmetal man. Dim.r. 133
289.	Hingorî	Maweya zemanî ya ji tarîbûnê hetanî dema razanê. FDUD.r. 174	Ew hê di xewa hingorê de ne. Dim.r. 139

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
290.	Remildar	Falevêj. FDUD.r. 335	Dîlber çû cem remildêr. Dim.r. 144
291.	Hewirîn	Lê civîn û kombûn. FCEB.r. 297	Li kî dere eskerê Îranê hewirîye. Dim.r. 169
292.	Fîte	Firsent, fetwa. FDUD.r. 124	Li eskerê Îranê bakevin û ti fitê dein wan. Dim.r.170
293.	Colan	Landik, dolîdank. FK.r. 137	Hêj Feyza Xanim di halan de bazirganekî colanek li bajarê Bexdayê dabû çêkirin. Dim.r. 173
294.	Zêbare	Karê bi taybetî ji bo malekê, karê bi hevre. FK.r. 764	Di gundan de gazî zêbarîyan dîkin ku hiriyê veçiri, şeh bikin. Dim.r. 181
295.	Xulq	Bêhna dil. FCEB.r. 306	Ew çend mehbûn wî xulqa Feyza Xanim a şerîn ne di bihîst. Dim.r.193
296.	Rimbaz	Kesê ku baş dizane rimbê bikar bîne. FCEB.r. 242	Berê peşîn eskerê rimbaz hat. Dim.r. 203
297.	Bazbend	Nivîştî, neşte. FCEB.r. 54	Dîlberê ji bo Şebab li cem melayekî bazbent daye çêkirin. Dim.r. 207
298.	Hevraz	Evraz, jorîn.	Hevraz, ber bi çiyayê jorîn diçûn. Dim.r. 219

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
299.	Bala	Benz, bilind. FCEB.r. 71	Di rê de tên an bala tên. Dim.r. 235
300.	Nixilî	Daxilî, darêjî erdê.	Esker nixilî erdê. Dim. 245
301.	Hêsa	Sekinandin.	Serdar Xan esker da hêsandin. Dim.r. 244
302.	Dilêr	Aza, mêrxas, serbes. FCEB.r. 598	Ew mirovekî diler. Dim.r. 250
303.	Netebitî	Kesê nikare xwe ragire, sivik. FCEB.r. 212	Mirovekî netebitî bû. Dim.r. 250
304.	Qerf	Henekên bi mane, gotinên hişk. FCEB.r. 229	Li mala wî dewletî qerf pê kirin, gotinê Hopo. Hop.r. 30
305.	Xêlif	Derew, cont, zîr, qelp. FCEB.r. 99	Ez rast an xêlif xeber bidim? Hop.r. 36
306.	Bilyan	Zana, jîr, aqil. FK.r. 234	Zînê keçeke bilyan û serwext e. Hop.r. 51
307.	Rusa	Rusanî, fihêtkarî. FCEB.r. 245	Zînê denge Sertîp bihist wê xwe winda kir û rusa bû. Hop.r.51
308.	Teba	Tişt, madde. FCEB.r. 271	Sertîp niqasha Zînê û Rostem bihîst çû cemwan got ev çi teba ye. Hop.r. 55

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaranînê
309.	Xislet	Ehlaq, sinç. FDUD.r. 112	Filit bi piçûkan re piçûk bi mezinan re mezin bû. ji bo wî xisletî gişan jê hez dikir. Hop.r. 95
310.	Şandilxwaz	Dildarî, dilevîn. FCEB.r. 117	Filit bi şandilxwaz çû enîya şer. Hop.r. 98
311.	Bade çû	Pûç çû, beyteşe çûyîn.	Ew gumana dersdêr bade çû. Hop.r. 101
312.	Qepezep	Ser xwe, hêzdest.	Çia tu dibêjê ez nikarim, şikir tu hêj qepezepî. Hop.r. 101
313.	Terecan	Gencînî, ciwanî.	Lawo tu hê cahîlî terecanî. Hop.r. 128
314.	Wehd	Wext, dem.	Wehdê ekînê payîzê derbas dibe. Hop.r. 146
315.	Teyfik	Tas, şerbik. FCEB.r. 148	Zelexê mast kir teyfikê û danî ber Hesên. Hop.r. 148
316.	Kêlendî	Şalok, daseke deve wê wek kere heyvê ye. Pê giha tê dirûn. FK.r. 638	Kêlendiyên xwe dan ser milên xwe û çûn. Hop.r. 149
317.	Qesidîn	Lê qewimîn	Payîz li Axparanê timî berî Araratê diqesidî. Hop.r. 158

H.P	Peyv	Wate	Mînaka Bikaraninê
318.	Civ	Xwar.	Çima tu dûz naçî civ diçî. Hop.r. 175
319.	Nixavtin	Dapoşîn, peçinandin. FK.r. 473	Hûn êdî dikarin xwelîyê bavêjin ser lûleyan û binexêvin. Hop.r. 179
320.	Selexane	Pêgiran, teral. FDUD.r. 295	Hûn selexane ne, pak naxebitin. Hop.r. 180
321.	Pizî	Di kincan de cihê ku doxînê tê re dikin. FDUD.r. 305	Pizîya şale wî girt. Hop.r. 184
322.	Pay	Fort, pesna bi derewan. FDUD.r. 143	Paye xwe nede. Tu wekî xwe mayî Hop.r. 185
323.	Elewat	Bi taybetî ji ber timtêl sersîçeyê xwe, ketibe rewşeke ecêb û pêkenî. HOP.r. 275	Wekî te ji pêş de elawetî me bikira me tê kare xwe bikira. Hop.r. 187
324.	Bengz	Reng, gon, fillanî sorgun e, filanî xwesgun e. FCEB.r. 151	Bi bengzê xwe ve merivekî bê qusûr e. Hop.r. 188
325.	Hewisandin	Lê temrîndan kirin, amojandin. FDUD.r.	Ez renga wê dihewişînim, min li ciyekî dîtîye. Hop.r. 221
326.	Lec	Devjenî, niqaş. FDUD.r. 227	Em bi gundê Darebiyê re ketine leçe. Hop.r. 232

ENCAM Û PÊŞNÎYARÎ

Di vê xebatê de nivîskarê kurd yê ji edebiyata Sovyetê Erebe Şemo di bin du sernavan de hat lêkolîn kirin. Di bin sernavê lêkolîna yekem da jîyana wî, kesayetîya wî ya edebî û hin lêkolînên li ser kesayetîya wî ya edebî hatine kirin, hat lêkolîn kirin û destnîşan kirin. Di bin sernavê duyem de jî helwesta romanên Erebe Şemo hat lêkolîn kirin û piştî ferhengokek piçûk a romanên wî hat li darxistin.

Di encama vê lêkolînê de hat destnîşan kirin ku nivîskar, di romanên xwe de kevneşopîya gelê kurd bi helwesta Realîzma Sosyalîzmê re bi devoka Serhedê nivîsandine, axaftina rojane ya serdema xwe bikar anîye. Ji ber vê yekê mirov di nav rûpelên romanê de rastî gelek peyvên bilêvkirina nivîskar a bi xweser tê. Bi tevahî 325 peyvên kurdî yên ku nivîskar li gorî terza bi lêvkirina xwe nivîsandine hatin rêz kirin. Di encama hin lêkolînan da tê texmînkirin ku peyvên hatinê destnîşan kirin bi gelemperî ji herema Serhedê ne. Anku herema Erebe lê hatî dinê û lê mezin bûyî.

Bi gelemperî di romanên da hat destnîşankirin ku ji bilî peyvên kurdî peyvên ermenîkî, erebî, rûsî û tirkî jî hene. Lê vê xebatê tenê xwe li çerçoveya peyvên kurdî girtîye. Laboratûvarên bicihkirina bernameya damezirandina Komerên Sovyetê, navendên wekhevî, pêşketî û modernîzekirinê, gund bin jî di vê rewşê de, dûrketina nivîskar ya ji erdnîgarîya Serhedê, bandora bajarvanîyê û têkiliyên dewletên serdest yên wekî rûs û ermenan jî berbiçav e. Li ser vê esasê di romanên nivîskar ên dawî de cihê peyvên kurdî, peyvên jîyana nû ên Komarên Sovyetê yên wekî kolxoz (ji bo gelek malbatan li ser erde dewletê karsazîya hevpar a çandinê), kostomol (sosyalîstên ciwan), xwendîgeh, dispanser, makîne, trê, partî, sendîqa, zavod (kargeh an fabrîqe) û hwd cih digirin. Disa di romanên nivîskar yê dawî de behsa fonksiyonên bernameya damezirandinê a Komerên Sovyetê tê kirin.

Di xebatê de gava romanên Erebe Şemo li gorî rêzîknameya tarîxî ve hatin xwendin, di rewşekî berbiçav de hate dîtin ku ji rêzê ve gotinên bi lêvkî yên di berhemana de hatine bikar anîn, hejmara wan her ku diçe kêr dibe. Di romana

Şivanê Kurmcan da (romana nivîskar ya yekem) 66 peyvên lêvkî yên kurmacî hatin tespît kirin. Di romana Berbang de 155 peyvên lêvkî yên kurdî hatine bikaranîn. Bi vê romana nivîskar re hejmara bikaranîna hêmanên axaftinê yên bi lêvkirina nivîskar re gihejtîye asta herî jor. Ji vê romanê û pêve hat dîtî ku bikaranîna hêmanên axaftina bi lêvkirinekî xweser kêr dibin. Romana nivîskar ya bi navê Dimdim ku rûdana wî ji herema Serhedê dûr hatiye qewimandin 58 hêmanên axaftina kurdî yên nivîskar li gorî terza xwe nivîsandine hatin destnîşankirin. Ji hêla rêzîknameya tarîxî ve romana ku dawîn hatiyê nivîsîn a bi navê Hopo de, tê dîtî ku hejmara vegotinên lêvkî ên kurdî digihijîna asta herî jêr. Bi giştî 22 peyvên lêvkî ên kurdî hatin tespît kirin. Ji ber vê yekê di vê romanê de pîranîya peyvên hatinî bikaranîn, peyvên piştî Şoreşê yên jîyana nû ne. Hêmanên axaftina kurdî kêr in. Peyv bi gelemperî nîşaneya jîyana nû a damezirandîna Realîzma Sosyalîst in. Ji ber vê yekê mebest li ser pergala nû ya Sosyalîzmê, rêvebirina karê kolektîfî yê kolxozê û li ser devoka temsîlkarên Sosyalîst ên kurd bû.

Ji aliyê naveroka romanê ve jî dikare bê gotin ku, romanên Erebê Şemo otobîyografîk in. 4 romanên Ereb li ser bîngeha heman rêgezê, derbareya şert û mercên wê heyama ku Ereb di nav de jiyaye û derbareya rewşa kurdên wê demê de agahiyên rasterast didin. Ereb di romanên xwe de behsa gundiyên kurd dike, jiyana wan ya li gundan li ser zimanê vegêr û karakterên cuda gelek caran gotinên pêşîyan û stranên gelêrî vedibêje. Di her pênc romanên de gotinên pêşîyan, peyvên xweser û folklorhêzî serdest e.

Di encamê de wekî pêşbînî dikare were gotin ku, bikaranîna hêmanên axaftina di romanên Erebê Şemo de dê curbecur peywîrên cuda pêk bînin, wekî mînak dê ev hêman bikevin nav edebiyata kurdî ya nivîskî, dê pêşî li windabûyîna wan wê were girtin û di heman demê de dê ew peyv benê ceribandî û dê bikevin nav xebatên zaravayî, û dê bibin mijara lêkolînên zanistî yên di warê zimênî de.

Ji bo vê xebatê, gava ku bi armanca ferhengê berhevkarîyê û tevkarîya wê ya ji bo zimanê kurdî were hesibandî, peyvên ku neketine di nava zimanê edebîyatê, lê belê yên di nav gel de dihatin axaftin, tê texmîn kirin ku dê

feydeyekî wekî ferhengekî berhevkarîyê ji bo zimanê kurdî bi xwe re bîne.

Encamên ku ji vê lêkolînê hatine standin dikarin di lêkolînên zimên de bêne bikar anîn. Di çarçoveya vê lêkolînê de 5 pirtûkên Erebe Şemo ên cureyên wan roman in hatine hilbijartin. Xebata gotinên lêvkî ya bi vî rengî di heman demê de dikare li ser cureyên nivîskî ên Erebe Şemo yên din jî bîn kirin (romanên destanî, çîrok, şano)

Di vê lêkolînê de, peyvên lêvkî yên di romanên Erebe Şemo de bi gelemperî di warê bêjeyan de hatine nîqaş kirin. Di lêkolînek din de, vegotinên ku li vir hatine diyarkirin di warê cureyên bêjeyê de berfîrehtir û hûrgulî dikarin bêne dakêşandin. Di heman demê de bêyî ku romanên Erebe Şemo bi vegotinên lêvkî bîn sînorkirin, di warê kurdî de li ser bingeha lêkolîna binbeşa cureyên peyvan jî dikare were nirxandin.

Nimûneya ku ji xebat an xebatên Erebe Şemo hatî hilbijartin dikare bi rêzîknameya dîrokî ve were vekolandin, û rewşa bikaranînê û hejmara gotinên devkî, zêdebûyîn / kêmbûyîn bikaranîna van peyvan li ser bingeha navberên dîrokî dikare werin vekolîn.

ÇAVKANÎ

- A.R.T, D. (2019). “*Folklor di Romana Ereb Şemo ya Şivanê Kurmanca de*”. Nûbihar, 23, 76-80.
- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar.
- Adıgüzel, D. S. (2004). “*İsmail Şıhlî'nın Ayrılan Yollar Romanı ve Sosyalizm Realizm*”. A.Ü. Türkiye Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, 116.
- Akdağ, M. (2019). *Realist Rus Edebiyatından Erken Dönem Sovyet Sinemasına Gerçek Mekan Kullanımı*. MANAS Sosyal Araştırmalar Dergisi, 8(3), 3-4.
- Alakom, R. (2009). *Kars Kürtleri*. İstanbul: Avesta.
- Alan, R. (2013). *Bendname*. İstanbul: Peywend.
- Alan, R. (2013). *Folklor û Roman*. İstanbul: Peywend.
- Andaç, F. (1996). *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri*. İstanbul: Bağlam.
- Aylanç, M. (2016). *İsmail Bozkurt'un Romanlarında Realist Roman Kişileri ve Karakterizasyon*. Uluslararası Kıbrıs Üniversitesi folklor/edebiyat Dergisi, 22(87), 1-2
- Baqir, A. (2007). *Ji Şivanîyê Ber bi Zanyariyê ve*. W (15), 47.
- Bedirxan, C. E. (2009). *Ferheng*. Diyarbakir: Avesta.
- Botî, K. S. (2006). *Ferhenga Kamêran*. Hewlêr: Spirêz.
- Boyîk, E. (2007). *Hîndarê Edebîyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî Erebê Şemo*. W (15), 17-26.
- Boyîk, E. (2019). *Çanda Kurdên Sovetê*. İstanbul: Peywend.
- Bruinessen, M. v. (2005, Bihar). *Türkoloji Varsa Kürdoloji de Vardır, Kürdoloji; Kürtlerle ilgili bütün Bilimleri Kapsar*. Kovara Bîr, 15-20.
- Can, H. (2017). *Kürtler ve Stalin*. İstanbul: Ceylan.
- Celalî, M. (2014). *Di Romanên Erebê Şemo Jiyana Bextewar û Hopo de Tîpên Şoreşker ên Romantîk*. Nûbahar, 17(126), 72-76.
- Çaçan, X. (2007). *Miletek Di Hayra Wî De Bû*. W (15), 27.
- Çaçan, X. (2017). *Qiseyên Cimaetê*. Diyarbakır: Lîs.

- Çevik, S. (2014). *Her Kurd deyndarê Kurdên Qafqasyayê ye*. Nûbihar, 17(126), 3-4.
- Çoban, B. (2017). *Li Pey Şopa Lehengên Erênî û Şoreşger Di romanên Kurdî Yên Sovyeta Berê De*. Wêje û Rexne (9/10), 105, 122.
- D.İzolî. (2007). *Ferheng*. Diyarbakir: Deng.
- Demîrhan, U. (2007). *Ferhenga Destî*. Ağrı, Türkiye.
- Eşo, W. (2014). *Konferansa Kurdzanîyê ya yekemîn li Yerîvanê*. Nûbahar, 17(126), 6-8.
- Ergün, Z. (2018). *Fonksiyonên Hevneş û Zincîreya Rûdanê di Vegerana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê da*. e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, 10(3), 805-818.
- Ergün, Z. (2018). *Taybetmediyên Vegêrana Edebîyata Kurrdî ya Sovyetê*. Mukaddime, 9(1), 133-155.
- Evdilrehman, E. (2012). *Gundê Mêrxasan*. Diyarbakir: Lîs.
- Farqînî, Z. (2010). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî.
- Ferho, M. (2011). *Rewşa Romana Kurdî*. İstanbul: Do.
- Gök, M. (2014.12.06) *Sol Haber*. <https://www.insanokur.org/kurt-aydinlanma-06.03.2021-portreler-erebe-semo/>
- Gören, E. (2013). *Di Romanên Erebe Şemo De folklorê Kurdî*. (Teza nehatiyî Çapkrin a Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtuya Zimanên Zindî û Çanda Kurdî), Mardin, 2013
- Gültekîn, N. (2014). *Qonaxa Rewşenbîriya Zimanê Kurdî û Radyoya Erîvanê*. Nûbahar, 17(126), 27-35.
- Gültekin, M. (2014). *Kurdên Qafkasya Başûr-Dîrok û Zargotin*. Nûbahar, 17(126), 21-26.
- Göz, D. K. (2016). *Kırgız Edebiyatında Olumlu Kahramanlara Dair*. Manas Sosyal Araştırmalar Dergisi, 5(2) 4.
- Gün, M. (2018, 06 20). *Yaşar Kemal'in Rommanlarında Mahalli Söyleyişler ve Türkçe Bakımından Değerlendirilmesi*. İzmir: (Teza Nehatiyî Çapkirin a Zanîngeha Ege a Lîsansa Bilind), İzmir, 2018
- Gürtürk, E. (2016). *Bandora Rêbaza Realîzma Cıvıparêz di Şivanê Kurmanc an de*. Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, 2(3), 5-6.

- Kadiođlu, H. (2020). *Evren ve rneklem*. 05 06, 2020
https://scholar.google.com.tr/scholar?q=hasibe+kad%C4%B1o%C4%9Flu+evren+ve+%C3%B6rneklem&hl=tr&as_sdt=0&as_vis=1&oi=scholart:sbf.marmara.edu.tr adresinden alındı
- Karataş, Z. (2015). *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*. Manevi Temelli Sosyal Hizmet Araştırmaları Dergisi, 1(1), 19.
- Kendal. (1978). *Mirina Erebe Şemo*. Azadî (3), 20,22.
- Köprülü, M. F. (1999). *Milli Edebiyat Cereyanının İlk Mübeşşirleri*. Ankara: Türk Tarih Kurumu.
- Kurdo, Q. (2010). *Tarixa edebiyata Kurdî*. Diyarbakir: Lîs.
- Levent, A. S. (1984). *Divan Edebiyatı Kelimeler ve Remizler, Mezmunlar ve Mefhumlar*. İstanbul: Enderun.
- Merwanî, C. (2020, 12 13). *Vikipidi*. 05 06, 2021 Vikipedi, özgür ansiklopedi:
https://tr.wikipedia.org/wiki/Ermenistan_Devlet_Radyosu adresinden alındı
- Nûbihar. (2014). *Dîrok, Edebiyat û Çanda Kurdên Sovyeta Kevin û Qafkasan*. Nûbihar, 17, 126.
- Opengin, R. A. (2014). *Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*. İstanbul: Peywend.
- Ospanova, G. (2017). *Sosyalist bir Roman: Karaganda*. Uluslararası Afro-Avrasya Araştırmaları Dergisi. (5)
- Özkırımlı, A. (1987). *Türk Edebiyatında akımlar*. İstanbul: Cem Yayınevi.
- Parıltı, A. (2009, 08 26). *Sabit Fikir*. 07 18, 2018 tarihinde
<http://www.sabitfikir.com/dosyalar/kurt-edebiyati-nereden-nereye> adresinden alındı
- Reşan, N. G. (2008). *Navdarên Kurd*. İstanbul: Doz.
- Sartık, N. (2014). *Taybetîya Romannûsîya Kurdên Qafkasyayê*. Nûbihar, 17, 84,86.
- Serdar, E. (2015). *Êdî Dereng Bû*. Diyarbakır: Lîs.
- Serdar, E. (2017). *Pêşdaçûyîna Lîteratûra Kurdaye Sovêtîê*. Wêje û Rexne(9,10), 6,22.
- Seyarî, A. (2020). *Tehlîla Romana Dimdim a Erebe Şemo*. Nûbihar, 23, 66-73.

- Şemo, E. (2009). *Şivanê Kurmanca*. Diyarbakır: Lîs.
- Şemo, E. (2015). *Şivanê Kurmanca*. Diyarbakır: Lîs.
- Şemo, E. (2016). *Dimdim*. Diyarbakır: Lîs.
- Şemo, E. (2016). *Hopo*. Diyarbakır: Lîs.
- Şemo, E. (2017). *Berbang*. Diyarbakır: Lîs.
- Şimşek, A. Y. (2018). *Sosyal bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*. Ankara: Seçkin
- Tangızade, L. (2006). *Sosyalist Realizm: Kökeni, Oluşum Süreci ve Kavramı*.
Modern Türklük araştırmalar Dergisi, 3(4), 1.Yayınevi.
- Taştepe, S. B. (2013). *Evren ve Örneklem*. Ankara: Vize Yayıncılık
- Uzun, M. (1991). *Destpêka Edebiyata Kurdî*. Ankara: Beybûn.
- Uzun, M. (1992). *Kürt Edebiyatına Giriş*. Ankara: Beybûn.
- Uzun, M. (2015). *Kürt Edebiyatı Antolojisi*. İthaki Yayınları.
- Üzgür, T. (1983). *Edebiyat Bilgileri*. İstanbul: Veli.
- Xelîl, T. (2007). Erebe Şemo Rûspîtiya Gelê Kurd. W (15), 29,30.
- Xelîl, T. (2014). *Antolojîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*. İzmir: Na.
- Yusuf, H. (2011). *Romana Kurdî*. Diyarbakır: Ronahî.
- Yücel, C. S. (2018). *Kürt Edebiyatının Anatomisi*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Zanyar. (2017). *Ferhenga Zanîn*.
- Zinar, Z. A. (2007). *Nivîskarê Kurd Suxrevan û Kedkarê Wêjeya Kurdî*. W(15), 33-35.
- Zinar s://tr.wikipedia.org/wiki/Ereb%C3%AA_%C5%9Eemo. 10 09, 2021 tarihinde <https://tr.wikipedia.org>. adresinden alındı.
- Zinar, Z. (2014). *Kurdistana Sor*. Nûbahar, 17 (126), 68-71.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

01/10/2021

Tez Başlığı / Konusu:

EREBÊ ŞEMO Û FERHENGOKA ROMANÊN WÎ

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 86 sayfalık kısmına ilişkin, 01/10/2021 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından Turnitin intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı %4 (dört) tür.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

01/10/2021

Medya KARAKAYA

Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Medya KARAKAYA

Öğrenci No : 17950001017

Anabilim Dalı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Programı : Örgün Eğitim

Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN

Dr. Öğr. Üyesi Haşim ÖZDAŞ

01/10/2021

ENSTİTÜ ONAYI

UYGUNDUR

01/10/2021

~~Doç./Dr. Abdulhadi İMURTAŞ~~

Enstitü Müdürü